

kerokê Giştî yê PKK'ê
Muhammed Öcalan, da
wî ji kî Artêşa Tirk
ji wê partiyeke
wî bi rê xistiye, bi
wî jî hêvî
vegera.
Wî jî PKK'ê jî diyar
wî bi wê bi vê
wî jî Tevgera Kurd
wî jî hîna xurtir
wî jî Öcalan got ku
wî jî gendekê Tirk
wî jî hêvî veşandê di
wî jî gendekê mekî.
Wî jî wî jî 6
wî jî dîstûr meke.

Artêşa tirk ji başûrê Vietnamê vedigere

Hevpeyvîn Koma Amed:
Em hunermendên
şoresger in
Rûpel 8-9

Mahmut Yıldız:
Jêderka zimanê
Hînd-Ewrûpî Kurdistan e
Rûpel 4-5

Servet Yükselir:
Binefşa Narîn û
Cembeliyê Mîrê Hekarî -I-
Rûpel 10

NAVEROK



6

Ahmed Huseyin: Melkemot û hilma jiyane



7

Azad Altun: Ahmet Arif li NÇM'ê hate biranin



12

Dicle Nas: Ji Farqinê du listikên zarokan

Ji Xwendevanan

NASÎNA min a bi xwendin û nivîsandina bi kurdî bi derketina welatan (Welat, Welatê Me, A. Welat) re dest pê dika. Ji wê mêjûyê hetanî ve gavê seraqet her hefte min rojnâmeya xwe standiye. Ez dikarim bi hêsaniyê bibêjim ku xwendina wê ji min re bûye wekî kîşandina cixarê, ji lew re gava ku derengî bimînim, ji min kirî ku tiştekî min winda bûye.

Îro ez dikarim ji tirkî çêtir bi zimanê xwe ye ziknakî bixwînim, binivîsim, fêm bikim û bidim fêmkirin. Heta ez dikarim bibêjim li ser mijar û gelemşeyên ranyarî, civakî, neteweyî û yên zanyarî dikarim, her cure gûfûgo, nîqaş, peyivîn bi hêsaniyê bikim. Gava mirov bixwaze dikare hînê her tiştî bibê. Min divê bi vê mebestê, nexwasim ciwanên kurd vexwînim xwendin, nivîsandin û peyivîna bi kurdî. Bila neyê jibîrkirin ku Azadiya Welat, azadiya ziman e.

E. HİKMET ÇIYAYÎ

BERIYA ku ez dest bi nivîsa xwe bikim, ji we re hêviya xwe hesreta xwe hezkirina xwe birêziya xwe dişînim. Hemû quweta rûyê erdê bi we re be. Her çiqas ku em nikarin aliyê we bikin jî, lê tim û tim dilê me seba we mirovê birûmet û hêja dika gurmîni. Em du heb xortên kurd li Girtîgeha Metrîsê ne. Ji sūcê adlî radizên. Qasî ku ji destê me tê em xwe hîn zimanê xwe dikin û peymanekê didin we emê her hefte deh rojnâmeyan bistînin. Emê ji girtiyên kurd re bibêjin, bira ew jî bistînin. Em vê xebatê ji xwe re wekî deynakî dibînin. Qene em girtîbin jî bira jî bona saziyê wekî we şixulekî me hebe. Emê vê xebatê bi dil û can bikin. Bimînin bi xêr xweş.

MURAT ASLAN - BÜLENT ŞIŞKİN



Şerefname û sersariya kurdan

SAMÎ TAN

Dema germahiya şer tîna xwe dide civakê, rojev serobin dibe. Em jî bivê nevwê li pey rojevê diçin; li gorî zanîna xwe bûyer û qewimînan şîrove û rave dikin. Ev rêwş jî bo civakeke di nava şer de tiştekî xwezayî ye. Lewre qedera gelê me bi vî şerî ve girêdayî ye.

Her wekî berê jî me gotibû, hin caran mirov dikare li ser mijarên din jî raweste, ji ber ku jiyana ne yekalî ye. Lê mixabin ji ber germahiya şer hin caran mirov derfeta vê yekê nabîne. Hinek roj û bûyerên girîng jî wisa bêdeng derbas dibin.

Divê bê gotin ku ji ber germahiya şer, gel jî pejkariya xwe li hemberî hinek tişt û bûyerên girîng winda kiriye. Dema di weşanekê de şer û şervanên xwe nabîne, eleqeyê nîşan nade. Ev helwest hin caran mirovan kêfxweş dika, lê divê mirov li ser bi baldarî raweste. Lewre hezkirina ji nîrxan, girêdayîbûna bi hin nîrxan ve divê nebe sedem ku em çavên xwe ji dewlemendiya jiyane re bigirin û li hemberî dîrok, ziman, çand û şexsiyetên xwe yên neteweyî sersar bin.

Bo nimûne îsal salvegera nivîsîna pir-

tûka hêja Şerefnameyê ye. Dîroknasê hêja Şerefname Bedlîsî ev berhema xwe di sala 1597'an de qedandiye. Kurd divê bi vê berheme û nivîskarê wê serbilind bin. Vê salê bi çalakîyên ji bo pîrozkirina vê bûyera girîng bixemilînin. Lê mixabin em tevî ku gihîştine nîveka vê salê jî, heta niha tu çalakîyên berbiçav li ser vê mijarê nehatine lidarxistin. Bi tenê di kovara Nûdemê de çend nivîsên hêja li ser vê berheme û nivîskarê wê hatin weşandin.

Hinek kes jî ber ku ev berhem bi farişî hatiye nivîsîn bi çavekî nebaş li berhemê û nivîskarê wê dinêrin. Lê ew helwest ne di cihê xwe de ye. Lewre wê demê zimanê farişî wekî zimanê rewşenbîrên herêmê dihat dîtin. Rast e, heke ev berhem bi kurdî bihata nivîsîn baştir dibû. Lê kes nikare vê rastiyê weşere ku ew berhem li ser dîroka kurd û Kurdistanê ye û bi hestên neteweyî hatiye nivîsîn. Her wiha lêkolîner didine zanîn ku digel agahiyên li ser dîroka kurdan, nivîskar li ser jiyana civakî ya kurdan jî agahiyên hêja dane. Dîsa, tevî ku ew berhem berî niha bi salan li zimanê kurdî (kurmançî û soranî) hati-

ye wergerandin jî, niha li piyasa çapeke wê pirtûkê bi kurdî nîn e. Tu weşanxane û sazî dest navêjin vî karî.

Xuya ye ku di vî warî de bi giranî bawerî dika ser sazî û rewşenbîrên kurd. Rexne jî divê bi giranî li wan bîn girtin, lê dema gel eleqeyê nîşanî van mijaran nede sazî jî nikarin tu gavan biavêjin.

Mirovên mîna Şerefname Bedlîsî, divê li ber dilê gelê kurd gelekî delal û ezîz bin, lewre wan di warê zanistî de navê gelê kurd bilind kiriye. Li gelek cihan mirov bi riya kes û şexsiyetên wiha navê kurdan dibihîzin û li ser doza gelê kurd dibin xwedî agahî.

Dema em bi zanîna û pejkariyê li ser rawestî, emê bibînin ku kesên bi vî rengî gelek in. Lê ji ber ku em li wan xwedî derneketîne gel û dewletên din ew jî xwe re kirine mal.

Hin caran mirov di pîvanên nêzikîdayîna hinek kes û saziyên kurd jî nagihêje. Lewre li kesên ku di tevahiya jiyana xwe de ji kurd û kurdîyê reviyane xwedî derdikevin, lê qet guhê xwe nadin kesên ku li ser kurd û Kurdistanê berhem dane. Dema mirov bi baldarî li meseleyê dinêre, tê dîtin ku em hê nebûne, kurdên Kurdistanê. Lewre ew kesê kurd, gava li nav sînorê dewleta ku em lê bindest in navdar be, em li wî kesî xwedî derdikevin, lê gava ew li wir neyê nasîn em jî qet wî nayînin rojevê.

Al û mêtîngerî

KAHAR AKSOY- Î. XELÎL TÜRAN

Al çi ye? Al sembola nasnameya gelan e. Gel azadî û serxwebûna xwe bi alên xwe didin xuyakirin. Gelên xwedî rûmet tu caran ala xwe nakin sedemê xerabî, kîn û nefretan.

Şehîd li ber gelan pir delal û ezîz in. Ev ala ku şehîd di ber de canê xwe didin, ewqasî berz û biwate ye. Lewre xwedî li derketîna ala ku bi xwîna şehîdan hatiye afirandin, meseleyeke namûs û şerefê ye. Bi vê re jî wexta ku al tê gotin namûs, şeref û gel û netewê ten bira mirov.

Bi alê nasnameya gel tê nasîn. Welatek pê tê naskirin. Lehengî û dilêriya gelan pê tê xuyakirin. Ger li ser xakekê bê libakirin tê wê wateyê ku ew xak ne bixwedî ye û bi qasî pîrgirêka hebûn û tunebûna miletekî jî girîng e. Al, netewê di dika (sahne) mirovatiyê de di nav şahrezayiyê de biryar û xwesteka meşa bi rûmet şanî me dide û dibe nûnera serxwebûn û azadiyê.

Gelê ku ala xwe li asmanan li ba dika dereceya şexsiyet û xwedîderketina nasnameya xwe derdixe holê.

Lê ji bo mêtîngeran al tê çî wateyê û mêtînger çawa nêzikî alê dibin?

Dîroka serdestên tirk dîroka zilm û zorê, dîroka talan û dagirkeriyê ye. Di destê wan de al bûye nîşan û sembola mêtîngerî û dagirkeriyê. Lewma gir-

Em baş bi vê bawer in ku gelê tirk tu car dagirkirina welat û gelê kurd naxwaze. Lê belê serdestên tirk al kirine sembola pişaftinê, xwînrijandinê û ji wateya xwe ya rastî dûr emilandine.

miya tu gelan ji ala osmanî, giştîyê serdestên tirk re tune ye.

Gelên ku ji aliyê zordestan ve hatine dagirkirin, bi kîn û bi nefret li ala wan jî nefîna û nîşana neyartî û xwînmetî qebûl kirine. Hîmê mêtîngerê tirk û alê bi vî awayî hatiye hetanî damezirandina Komara Tirk.

Li cihanê gelan bi welatparêzî û serketina burjûwazî dewleta xwe ya neteweyî ava kirine. Burjûwazî li wan welatan, karker û gundî jî di bin serokatiya xwe de çavandine. Li dijî feodalîteyê bi van çînan re şer kirine. Lewma li wan deran ala ku burjûwazî li ser welatê xwe bilind kiriye meşrû hatiye pejirandin.

Lê belê, li KT'yê burjûwazî ne bi vî awayî dewlet ava kiriye û al bilind kiriye. Ya tirkan ji vanên jor cudatir e.

Komara Tirk di dema pêşveçûna kapitalîzmê de, yanê di dema împeryalîzmê de hatiye damezirandin û dijîtiya feodalîzmê nekiriye. Lewma komareke paşverû ye. Hetanî dawiyê li dijî çînan kedkar neyartî kiriye. Wekî din komareke dagirker û mêtînger e. Di bingeha wê de talankirin û qirkirina gelan heye. Sedema van xusûsiyetên kevneperest


û paşverû al di destê KT'ê de jî wekî dîroka wan, bûye sembola qirkirinê, talankirin û mêtîngeriyê. Ev al, li ser welatê kurdan, ermenan, rom û ereban bawerî zilm û zorê hatiye bilindkirin. Li wan gelan bayê mirinê bawesîn kiriye. Lewma ew al ji bo gelan nîşana zilm û mirinê ye. Gelên ku bixwazînin bijîn, ber vê sedemê heta dawiyê neyare vî alê ne.

Em baş bi vê bawer in ku gelê tirk tu car dagirkirina welat û gelê kurd naxwaze. Lê belê serdestên tirk al kirine sembola pişaftinê, xwînrijandinê û ji wateya xwe ya rastî dûr emilandine. Lewma beriya osmaniyan hetanî niha al bûye navgîna şikandina vîna gel, netewê çînan.

Îro jî vê konevaniya (siyaset) lewî û gemarî didin meşandin. Lewre di hê xwepêşandanê de, di karistan û dikana de û di kongreyên partîyan de çî malan de bi zor tê daliqandin.

Van mêtîngeran wekî her dem îro di nezera gelê me de ala xwe bi nîşan dagirkerî li ser gelê me dihejîne. Ev xwedî baweriyê mezînan in ku ala kes û sor û zer pir nêzik wê li ser welatê şerî li ba bibe.

HEYETA ku ji Akın Birdal, Weşankar Ünsal Öztürk û Parêzer Levent Kanat pêk dihat, di çarçoweya "kampanyaya Beşikçi" de li Swêdê bi Serokê Rêxistina Efüyê ya Swêdê Anîta Klûm û Direktorê Maseya Tirkîyeyê Ingrid Falkeyê re hevdiînek pêk anî. Heyetê ji rêxistinê xwest ku ew tewra xwe ya li hemberî Beşikçi biguherînin û wî wekî "girtiyê ramanê" bipejîrin. Lê berpirsên Rêxistina Efüyê daxuyandin ku ew, Beşikçi mîna "girtiyê ramanê" nabînin, lewre Beşikçi bi ramanên xwe piştewaniya PKK'ê dike. Birdal û Öztürk ev helwesta rêxistinê bi gotina: "Di destê Beşikçi de çek tune ye, bi tenê pênis heye" bersivandin.



NONERÊ Azadiya Welat ê Îzmîrê Fereç Çobanoğlu, ji doza ku li Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ya Îzmîrê dom dikir, tevî rayedarê HADEP'a Îzmîrê Medeni Çarboğa beraat kir. Fereç Çobanoğlu bi sedema ku di rojnameya Azadiya Welat de dixebite û rojnameyê belav dike hatibû binçavkirin, gelek tadeyî û îşkence dîtibû û paşê jî ew derxistibûn dadgehê. Dozger dixwest ku wan ji ber zağona 169. û 3713'yan ya xala 5'an ceza bike. Digel vê daxwaza dozger, dadgehê da zanîn ku xebata di Azadiya Welat de ne sûc e û ji ber nebûna delîlan her du bersûcan beraat kir.

NÛÇE

Artêşa Tirk ji başûrê Vîetnamê vedigere

Serok Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan da zanîn ku Artêşa Tirk xwe wekî partiyeke siyasî bi rê xistiye, bi plan û tevdir tevdi-gere. Serokê PKK'ê diyar kir ku wê bi vê têkçûnê, Tevgera Kurd li herêmê hîn xurtir bibe. Öcalan got ku heke generalên tirk, di bingeha rejîmê de hin guherînan nekin, wê temenê wan ji 6 mehan dirêjtir nebe.

Artêşa Tirk di 14'ê gulanê de bi hêzeke mezin çû ser Başûr. Ev tevgera dagirkirina başûrê Kurdistanê, wekî tevgera herî mezin dihat binavkirin. Di nava çend rojan de qala kuştina bi hezaran gerîla dihat kirin, lê bi xistina du firokeyan, hevkeşeya şer guherî. Niha li gorî agahiyên ku bi dest dikişin, Artêşa Tirk hêzên xwe ji herêmê vedikişîne. Tê gotin ku bi tiran erebeyên leşkerî ji herêmê vedikişin. Ajansên navneteweyî jî agahiyên bi vî rengî didin, lê hê jî generalên tirk îdia dikin ku niyata wan tune ku ji Başûr vekişin.

Ajansên ku bi salan e li welatên cur bi cur çavdêriya şer kirine, yekemîn car didin xuyakirin ku bikaranîna moşekan (fûze), PKK'ê hevkeşeya şer qulbandiyê aliyê xwe. Bo nimûne Reuterê roja 10'ê pûşperê de jî şerê Yekîtiya Sovyetê û mucahidên afganî tê bibîrxistin. Li gorî gotina wan, piştî ku mucahidan moşek bi kar anîne, hêzên dewleta Sovyetê serdestiya xwe ya li ezmen wînda kirine, ew jî bûye sedema vekişîna hêzên vî dewletê ji Afganistanê. Ev ajans, bi vî rengî qala MED-TV dike: "MED-TV'ya ku nûçeyê wê ya li ser xistina firokeyan hatiye rastandin" piştê jî nûçeya MED-TV ya di warê bisinorkirina tevgerên hewayî yê hêzên tirk de dide. Bi vî yekê re jî dide zanîn ku wê bandora wê bisinorkirinê li şer bibe. Her wiha nûçe didê zanîn ku moşekên PKK'ê rojeva Tirkîyeyê jî serûbin kiriye.

Niha derdorên siyasî diyar dikin ku wê bandora wê yekê li ser politîkaya dewletê ya di warê kêşeya kurd de jî bibe. Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan roja 13'ê pûşperê bi riya telefonê beşdarî benameyê MED-TV'yê ya bi navê Panel bû. Öcalan jî da xuyakirin ku Artêşa Tirk li hemberî gerîla têk çûye û ji mecbûrî generalên tirk xatirê xwe ji PDK'ê xwestine û dest bi vekişandina hêzên xwe kirine.

Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan da zanîn ku Artêşa Tirk xwe wekî partiyeke siyasî bi rê xistiye, bi plan û tevdir tevdi-gere. Serokê PKK'ê jî diyar kir ku wê bi vê têkçû-

nê Tevgera Kurd li herêmê hîn xurtir bibe. Öcalan got ku heke generalên tirk, di bingeha rejîmê de hin guherînan nekin, wê temenê wan ji 6 mehan dirêjtir nebe.

Hefteya çûyî ev çalakî û şer li Başûr, Bakur pêk hatin: Di 11 û 12'ê pûşperê de li başûrê Kurdistanê gelek çalakîyên ARGK'ê li hemberî PDK û hêzên tirk pêk hatin, di van bûyeran de PDK û hêzên tirk gelekî xesirîne. Li gorî agahiyên, li başûrê Geliyê Zapê, gerîla dor li komek pêşmergeyên PDK'ê girtine, di şer de fermahdarê bi navê Xabûr jî di nav de, 10 PDK'yî hatine kuştin.

Dîsa li herêma Şexnasirê Çomanê û li gundê Kelekê yê Rewandûzê, hêzên ARGK'ê avêtin ser hêzên PDK'ê, di vî şerî de 20 PDK'yî hatine kuştin. Her wiha li devera Etroşê gerîla ji 10 milan ve avêtin ser hêzên Artêşa Tirk, hate gotin ku piştî vî êrişê hêzên tirk ji herêmê vekişîne. Li vî herêmê navê leşkerê ku hatiye kuştin jî wekî Kenan Öngören hate daxuyandin. Li gorî agahiyên, Öngören jî İncesuya Kayseriyê ye. Li herêma Derkarê ya Haftanîne konvoyeke leşkerî ketiye kemîna gerîlayan, di şer de 16 leşker hatine kuştin.

Li bakur jî di 13'ê pûşperê de gerîla li Çêlê, li dora gundê Begor mayînan danîn, tê gotin ku li dora 10 cerdevanan pê li mayînan kirine û hatine kuştin. Dîsa li gundê Alakan, di navbera gerîla û cerdevanan de şer derketiye, piştê re gerîlayan du cerdevan bi xwe re birin. Gerîlayan avahiya emniyeta Xînisê dan ber guleyan di vî êrişê de polîsek hate kuştin, 2 polîs jî birîndar bûne. Li gorî çavkaniyên xwecihî ev bûyer di 28'ê gulanê de pêk hatiye, lê ji raya giştî hatiye veşartin.

Li gorî agahiyên OHAL'ê li sêgoşeya Gênc, Dara Hênê û Licê şer derketiye di vî şerî de astegmenek, 3 leşker û cerdevanek hatine kuştin. Çavkaniyên herêmî didin zanîn ku li devera Şîrîna herêma Barzan di navbera gerîla û hêzên PDK'ê de şer derketiye di şer de 2 PDK'yî hatine kuştin. Li herêma Begovayê jî du erebeyên leşkerî yê PDK'ê ketin kemîna gerîlayan, di vî êrişê de 4 PDK'yî hatine kuştin.



Rev didome

Li navçeya Şaxê ya Wanê gerîlayan avêtin ser cerdevanên ji eşîra Alan. Li vir di navbera cerdevan û gerîla de şer derket, di şer de 2 cerdevan hatine kuştin. Hêzên ARGK'ê dest danîn ser 300 heb heywanên cerdevanan. Li gorî gotina çavkaniyên xwecihî, komê cerdevan ketine pey gerîla, ji wan du heb hatine kuştin û gerîlayan xesar nedîtine. Tê gotin ku di 11'ê pûşperê de hêzên gerîla riya di navbera Geve û Esenderyê de birine, 20 erebeyên ku derbas dibûn kontrol kirine.

Li gorî agahiyên li sêgoşeya Lice, Qulp û Çewlik û li Adaklı di operasyona ku bi rênîşandariya îtirafkerekî didomin de, du gerîla hatine kuştin. Di şer de 20 heb jî leşker û tîm hatine kuştin. Li derdora Qulpê erebeyeke ku melzeme dibir herêma operasyonê ketiye kemîna gerîlayan, di vî bûyerê de 2 leşker hatine kuştin.

Roja 15'ê pûşperê gerîlayan li dora Hacı Ümran û Çoman ji gelek milan ve êriş birine ser hêzên PDK'ê. Di van êrişan de gelek PDK'yî hatine kuştin. Tê gotin ku cendekê 10 heb pêşmergeyên PDK'ê li erdê mane. Li hemberî gurbûna êrişên hêzên ARGK'ê 600 pêşmergeyên PDK'ê dev ji şer berdane û çûne mala xwe.

Her wiha li Bakur jî li herêma Perwersewdîne ya Culemêrgê, hate gotin ku hêzên gerîla bi şev çûne ketine çeperên hêzên dewletê yê ku bi roj bi kar fînin, piştî ku sibê leşker hatine, gerîla erebeyên leşkerî dane ber roketan di vî bûyerê de 8 leşker hatine kuştin, 20 leşkerên din jî ji hev be-

lav bûn. Gerîla piştî ku bi firokeyên kobra herêm bombbaran kirine, ji herêmê vekişîne. Li gorî agahiyên ku çavkaniyên herêmî didin, di vî bûyerê de bi giştî 10 leşker hatine kuştin. Li Segirkê û Şexan gerîlayan kemînan danîne pêşiya cerdevanan, li vir cerdevanek hatiye kuştin, du cerdevan jî dil hatine girtin. Li Kızılsuya Şîmexê roja 15'ê pûşperê êrişeke gerîlayan li dijî cerdevanan pêk hat. Di vî bûyerê de 2 cerdevan mirin, 3 cerdevan jî birîndar bûn.


Êvara 15'ê pûşperê gerîlayan avêtin ser hêzên tirk ku li dora gundê Ohasê yê Gêxiyê bi cih bûbûn. Di şer de 10 leşker hatine kuştin, 9 leşker jî birîndar bûne. Di vî şerî de gerîlayan kunyeyên leşkeran bi dest xistine. Kesên ku kunyeyên wan bi dest gerîlayan ketine, Ahmet Aktaş, Serkan Çiftçi û Ali Yılmaz in.

Roja 16'ê pûşperê gerîlayan avêtine ser kanên komirê yê li dora Dêrgula Şîmexê, li wir ji leşkerên ku kan dipan, yûzbaşiyek, 4 leşker, 2 cerdevan hatine kuştin. Dîsa di heman rojê de gerîlayan li dora gundê Gundikê Melê êriş birin ser erebeyeke leşkerî di vî êrişê de 6 leşker hatine kuştin.

Li aliyê din, gerîlayan roja 19'ê pûşperê, li Mesudiya Ordüyê li ser riya Topcanê, kontrola nasnameyan kirine. Di vî kontrolê de leşker li dijî wan derketine û şer derketiye, di vî şerî de 2 leşker hatine kuştin.

NAVENDA NÛÇEYAN

Jêderka Zimanê Hînd-Ewrûpî Kurdistan e



Kevnarebûna şaristaniya kurdan ji hêla gerokên ewrûpî ve jî tê pejirandin. Gerokên ewrûpî hatine Kurdistanê û li ser jiyana kurdan pirtûk nivîsandine. Bi vê yekê jî nemane, hinek dîmen ji jiyana kurdan xêz kirine. Ev wêne ji pirtûka İlhamî Yazgan a bi navê "Batılı Gezginlerin Seyahatnamelerinde Kürtler" hatiye wergirtin.

Zimanê herî kevn kîjan e? Binge-ha ziman û gelên Hîndî-Ewrûpî ku der e? Ziman û netewe wek kulîlk û bêhna wê ye. Dema ku kulîlk nebe, bêhna wê jî dernakeve. Bê-yî ziman netewe dernakeve holê. "Giya li ser koka xwe şîn tê" Netewe jî li ser ziman tê avakirin. Wekî ku tê zanîn, ziman û netewe di qonaxeke dîrokî de hatine afirandin. Ji bo wan keda mezin hatiye dayîn û pir xwîn riyaye. Gotineke pêşiyê me vê rastiyê rind tîne zimên: "Dara azadiyê bi xwîn û xwêdanê tê avdan." Niha dema çi ye? Dema ku em nixê xwe yên neteweyî (zimar, dîrok, çand û huner û hwd.) ji bişaftinê û ji nav destên dagirkeran rizgar bikin.

Ziman ew navgîn e ku mirov hest, raman û daxwaziyên xwe pê dibêjin an jî dinivîsin. Hostayê mezin Marks dibêje: "Ziman çeka ramanê ye." Çawa ku çîn û neteweyên bindest bêçek nikarin azadî û rizgariya xwe bistînin, mirovatî û netewe jî bê ziman nikarin tiştêkî bikin.

Çand, şaristanî, zanistî, ramanî bi ziman digihêje çilê (nifşê, neslê) nû. Ji ber vê rastiyê ziman, 'navgînê navgînan e'. Ne ji vê navgînê be rêxistin, artêş, dewlet jî dernediketin holê. Û wek ku tê zanîn bê rêxistin keriyê mirovan nedibû civak. Ma bê civak mirovatî çêdibe? Na. Bê ziman civak jî çênabe. Stalîn vê rastiyê wiha dide xuyakirin:

"Dema ku ji bo hemû endamên civakê zimanekî hevpar nebe, ew civak hew dikare hilberînê bike. Wê bela bibê, ji civakbûnê derkeve. Ji bo vê yekê, ziman hem navgîneke hayjihevîyê ye, hem jî navgîneke têkoşîn û pêşveçûna civakê ye." (*Binêrin li Marksîzm ve Dil Üzerine, rûpel: 29*)

Li her herêma ku mirov lê dijîn di pêvajoyê de zimanek hate afirandin. Bi koçberiya komên van mirovan, an jî zêdebûna wan devok, zarave an jî zimanên cuda çêbûn. Niha di dinê de çend komên (malbatên) zimana hene: Hînd-

Di gerdûnê de pêşî bapîrê me kurdan Gutiyân û cîranê wan yê ku ji Çiyayê Zagrosê hatine jêr, Sîneariyân (Sumer) dest bi nivîsandinê kirine. Zimanê kurdî di nav malbata zimanê Hînd-Ewrûpî de di qedîmbûnê de di rêza sêyemîn de ye. Yê yekemîn zimanê Mîtanîyan e, yê duweyîm zimanê Hatî ye.

Ewrûpî, Samî, Ural-Altay û hwd. Îro di nav neteweyên gerdûnî de, ji nivî zêdetir bi zimanê Malbata Hînd-Ewrûpî diaxivin. Zimanê bapîr û dapîrên me kurdî jî, ji vê malbatê ye. Gelo koka zimanê Hînd-Ewrûpî ku der e? Bi rastî bersiva vê pirsê girîng e. Çimkî bersiva vê pirsê, bersiva vê pirsê girîng jî dide:

Welatê seretayî yê gelên Hînd-Ewrûpî ku der e?"

Berî ku em belgeyê xwe deynin holê û ramana xwe îspat bikin, em bersiva pirsên li jor bidin çêtir e: Welatê seretayî û dayika zimanê gelên Hînd-Ewrûpî Kurdistan e. Ji Kurdistanê, di sala çarhezaran (B.Z) de belav bûne ber bi rojhilat, rojava, bakur ve çûne.

Pergeya me yî yekemîn efsane ne. Piraniya agahiyên efsaneyan, xeyalên mirov û gel in; lê dîsa jî ji wiyânê derketine holê û çelî rastiyekê dikin. Efsaneyên li ser mijara me bi vî awayî ye:

Neviyên pêxemberê Nuh, ji bo ku yekbûna ziman û gotinê berdewam bi-

da gerdûnê ye. Çimkî gotin heye li wî navenda vekirîbûnê, belabûnê ye. Navenda yek zimanê ku bûyiye pir ziman e. (*Binêr: F. Andaç, Rojnameya Evrensel, 9 Avrêl 1996*)

Pergeyê arkeolojî (kevnarezaniyê) dîrokê, endezyarî genan, etnolojî û efsane hev û din temam dikin. Çend belge ev in:

1) Profesore Zanîngeha Cambridge Colin Renfrew û Berpîrsê Înstîtuyê Rojhilat a Gurcistanê, Jhomas Gamkrelidze, her yekî pirtûkek li ser vî mijarî nivîsandine. Her du zanyar jî li gotinê belgeyên ziman û kevnarezaniyê didin xuyakirin ku gelên Hînd-Ewrûpî û zimanên Hind-Ewrûpî ji Kurdistanê li gerdûnê belav bûne. Ev koçberî B.Z. di sala çarhezaran de çêbûe (*Binêrin li Dr. Cemşid Bender, Kürt Tarihi ve Uygulanlığı, çapa pêncemîn, Rûpel: 67*)

2) Radyoya Komara Tirk, di havîna 1989'an de nûçeyêke balkêş da. Li gorî vî nûçeyê li Amerîkayê Kongreya Zimanmanzanan çêbûye û ev encam derketiye holê: Zimanê gerdûnê ji Kurdistanê belav bûne (Radyoyê ji Kurdistanê 'Anadolu' digot).

3) Dîsa di havîna 1989'an de, rojnameya Cumhuriyetê di kovara xwe yê hefteyî de lêkolîneke kevnarezaneke ewrûpî weşand. Vî kevnarezanî bi bergeyan îspat dikir ku gelên Hînd-Ewrûpî berî Îsa di sala çarhezaran de ji

Kurdistanê koçber bûne û zanyar ev agahiya girîng ji dida: Di dîrokê de ge-
le ku pêşi derketiye holê û çêbûye, Gu-
tîyûm in (Gutî), berî Îsa di sala çarhe-
zaran de derketine holê. Wekî ku tê za-
nîn Gutî bapirên kurdan in.

4) Ji aliyê zanista bijîşkê (TIP) ve jî ev hat îspatkirin. Profesore Fakulteya Bijîşka Zanîngeha Tornio ya beşa genetika mirovan, Alberto Pizazza û alîkar lêkolîner Luca Cavalli-Sforza û Paola, pirtûkek amade kirine. Navê vê pirtûkê ev e: "Dîroka Genên mirovan û erdnîgeriya wan". Tê de wiha dibêjin: "Civata mirovên Ewropa îro nêzîkî deh û şeş hezar sal berê; ji Rojhilata Navîn hatine. Lewre, ev bê nîqaş tê zanîn." (Binêrin li Rojnameya Milliyetê, 24 Rêbendan 1995, Kovara Rojnameya Cumhuriyetê ya bi navê Bilim ve Teknik, 4 Reşemî 1995)

Zimanê kurd, zimanê herî kevn e

Mezra-Botan wek ku tê zanîn dergû-
sa şaristaniyê ye. Nivîs, dewletbûn, çin û hwd. li vir dest pê kirin. Piştî daxuya-
niyên jor û ramanên gelek zanyarên kurd û biyanî gotûbêja koka gel û zimanê Hînd-Ewropî ji holê radibe. Piştî van rastiyan. Heke zimanê kurdî, çand û şaristaniyê gelên kurd ne dewlemend be û ne herî kevn be, ma ne nakokiyê-
ke mezin e? Belê, ku zimanê kurdî ne herî kevn bûya, çand û şaristaniya kurdan ne dewlemend bûya, wê nakokî çê-

bûya. Em vê mijarê hinekî vekin baş e.

Di gerdûnê de pêşi bapirê me kurdan Gutîyan û cîranê wan yê ku ji Çiyayê Zagrosê hatine jêr, Sîne-
ariyan (Sumer) dest bi nivîsandinê kirine. (Dr. C. Bender, Kürt Tarihi ve Uygarlığı) "Zimanê kurdî di nav malbata zimanê Hînd-Ewropî de di qedîmbûnê de di rêza sêyemîn de ye. Yê yekemîn zimanê Mîtaniyan e, yê duweymîzimanê Hatî ye. (Binêrin li Dr. Ahmed Susa, El Arap Ve'l Yahud, veguhestin: Faik Bulut, rûpel:83)

Ansiklopediya Ana Britannica jî li ser vê mijarê agahiyên balkêş nivîsandine: "Hûrî ji herêma Çiyayê Zagrosê hatine. Tê texmînkirin ku zimanê Urartûyan ji yê Hûriyan hatîye, (C;16, weşanên Hürriyet, rûpel:80)

Pirtûka Zerdest, Zend Avesta bandora xwe ji her alî ve li ser pirtûkên dî-
nî (olî) û ramanên dînî kirine. Ji bo ku ev bandor gelek e, encax bibe mijara gotareke dînî. Li vir emê li ser bandora wê ya li ser zimanan bi kurtasî rawestî.

Qurana pîroz ji Avesta gelek bêje (peyv) standine. Heta bêjeya "Dîn" jî ji



Avesta standine. (Binêr. M. Siraç Bilgin, Zarathustra, weşanxaneya Berfin). Bi kurtayî, "Tu zimanê zaravayên Arî nîn in ku tîkiliyên wan bi Avesta re nebin. (Binêr li M. Emin Bozarslan, Mem û Zîn, Weşanxaneya Hasat, rûpel 57)

Me qala Quranê kir, em vê agahiyê jî bidin baş e. Bêjeya Quranê ji zimanê birayên me yên hêja Asuriyan (Suryaniyan) hatiye.

Zimanê kurdî li ser vê bîngeha dewlemend şîn hat. Bapirê me Mediyan, "Hosteyê zimên, helbest û mûzikê

bûn." (M. Oruçoglu, Berfin Bahar, hejmar: 16, rûpel: 23)

Wekî encam: Ya ji van girîngtir ev e ku mirov lê xwedî derkeve. Çimkî bîngeha netewe ziman e. Lêxwedîderketin pêwîst e. Xwedî li zimanê kurdî derketin ev e ku mirov hînî xwendin û nivîsandina kurdî, bibe, çand û zargotina gelê me berhev bike û biweşîne. Peywira meyî rojane ya berçav ji temaşekirina MED-TV, xwendina Azadiya Welat, Jiyana Rewşen û Zendê ye.

MAHMUT YILDIZ

Hevîr û polîtîka

MEDENÎ FERHO



Çi tîkiliya hevîr û polîtîka bi hev û du re heye? Pirseke dûrî hişmendiyê ye ku her du peyv qet nayên beramberî hev. Hevîr, avê ard û hevîrtîş e, yanî haveyn e. Û polîtîka jî, heger ez ne şaş bim zanistek e ku hunerê tevgera civakî di hûnandina xwe de radigire. Hevîr, heger li mal be karê jinan e. Li firanan jî karê nanopêjan e. Polîtîka, li her hêla cîhanê karê polîtîkvanan e, di nava kurdan de (li her hêl û her cihê ku kurd lê cîwar bûne) di wateya mertalî de, bûye karûbarê her kesî. Bêguman bi giştî mijulaahiya bi polîtîka rojane re xisletek payeberî ye. Ev xislet nîşana hay jê hebûna tevger û bûyer û pêhatiyên guhertinî ye ku, jiyîna îro ve çendê pêwîst dibîne. Lê, ya herî seyr û dûrî hişmendiyê ew e ku hevîrpêj û polîtîkvan tevlihev bûne. Kî hevîrpêj e, kî polîtîkvan e nayê zanîn. Wekî ku rojnamevan û xwendevan ji hev û din nayên bijartin. Yan jî tevliheviya nivîskar û xwendevan. Ku tu dinêrî bacanfiroş dikare şîretan li rêvêberê, zebeşejmêrek dikare li ser gramerê kurdî dersan bide, kurfilkujek dikare bibe berpîrsek û hwd. Dixwazim çend mînakên bidim, da ku xwendevan têbigihîjin bê çî radigihînin û daxwaza min çî ye.

Berî çendakê bû, min romana xwe ya dawî, Xaltîka Zeyno xelas kiribû. Ji bo hinek guhertinan jî her dem li ber destên min bû. Mêvan hatin... Tevan jî li ser navîka xwe dibirî, lê min, ew xweş nas dikirin ku xwendevaniya wan û tîkiliya wan bi tevger û guhertinên kurdî re piştî hatina

Ewropa ye.

Ewropa jî wargêh û pêgîheke wiha ye ku şêr û pisîk û mişk û rovî tev tê de 'evdirreman' in. Yanî kur û biraziyê sercaşîkekî dikare bibe berpîrsek komeleyek kurdî. Ku li hişê wî nehat jî, lê dixê diçe Tirkîyê û li kêleka bav û apê xwe yê sercaşîk rûdine û nêçîra welatparêzan dike. Lê, dabaşa me ne ev e. İcar, çavên mêvanekî li koma belgên (pel-rûpel) reşbelek ket. Ew jî, nû nû bi kurdîtiyê, bi xwendin û nivîsandina kurdî mijûl dibê. Bi rahiştina koma kaxezan re ev gotin ji devê wî derket: 'Berî ku tu romana xwe çap bikî, bide min ez çewtiyên te rast bikim.' Ez jî erdê Xwedê de ketim, ku min ji sê hezar rûpel, tenê derdorê çarşê rûpelî hiştibû û salek û niv wextê min girtibû, her wiha xweş dizanim ku qet tîkiliya wî bi wêje û çandê re tune ye. Di jiyana xwe tev de, li dûv hev û din du roman nexwendine, di van rojên germ û tîr-xwîn de ser-rast rojnameyan naxwîne, dev ji wêjeya kurdî berdin, hay ji wêjeya cîhanê jî tune ye, nikare li ser du nivîskarên navdar ên cîhanê du gotinan bibêje, xwe di qada şîret û rastnivîsa kurdî de, di ya romanê de zana û pispor didît. Didu: Piraniya çaran em çend heval li kafeterya MED TV rûdinin û mîna her car li ser ziman, wêje, rojnamegerî, çanda kurdî diaxivin. Hew te dît mirovekî ji nişkê de xwe avête holê ku tîkiliya wî bes bi rojnameyên rojane re heye, dest bi axaftinê kir û hew rê da kesî ji me. Sisê: Berî çendakê bû, mirovekî nûpêkê nivîsek li ser rojnamegeriyê ji rojnamevanekî kurd re dixwend. Di nivîsa wî de şîret û rênîşanên mezin hebûn. Lê wî mirovî ne rojnamevanî kirîye, ne li ser rojnamevaniyê û pişeyê rojnamegeriyê du-sê pirtûk xwendine.

Piştî van mînakên, em vegerin ser mijara xwe ku bi rastî min qet nedixwest di nava nakokî û kumreşyan de cih bigirim û hê jî naxwazim. Ji bilî daxwaz û pîrsa neteweyî û sazî û dezgehên pişeyî. Ji ber ku qonaxa ku rewşenbîrên kurdan

tê de mane perçiqî û bêwate canêşiyekê dide min. Kesên hêja û payeberz di nava wan de hene. Mixabin di nava bîdengiyê şilûşat û korîşkî de hatine çilmisandin. Helbet tewanbariya herî mezin ya wan e. Ew mirovê pîrbêj û ku li ser navîka xwe bibêre, pêwîstiya rawestandina li ser nivîskaniyên canefsanê û cangoriyê Kurdistanê bibe. Çend gotinan li ser kîlên şikestî yên dîrokî û şikêrên wînda raweste. Çend gotinan li ber dagirkerî û galgalên li hemberî nîrxên kurdî bibêje. Gelo çima bîdengî? Lê, tiştê balkêş û mixabinî ew e ku pîr kesên hevîrpêj û bacanfiroş ku çend qurûşê wan çêbûne, her tişt tevlihev kirine û hê jî tevlihev dikin.

Ew mirovê ku di hemû jiyana xwe de tîkili civaka kurdî nebûne, di nava guhartin û daxwaza maf û mafekan de cihê xwe negirtine, di demeke kin de dikare bibe serkêşekî civakî.

Bêguman mafê wî heye, kes jî nikare bibêje çima. Heger dikaribe mafê kar bidê û ser û çavê polîtîka jî bi hevîr neke. Di dîroka cîhanê de tiştêkî wîlo nîn e jî, lê dîroka kurdan cuda ye, reş û spî tevlihev e, heya îro xiyaretê bêhtîr-jî welatparêziyê rûmet dîtîye. Ji ber ku welatparêzî her dem hatiye perçiqandin, xiyaret bûye xwedî paye. Lê qonaxa îro ne wîlo ye. Bi van gotinan ez behsa xeletî û şaşîyan nakim, gotina min li ser sistem û struktûrê ye. Di van rojên dawî de, em dibînin ku mirovên wiha, xwedî pîr xisletên cureyî, ku dikarin li ser her tîl û weris û dûwêlan bi canbazî bileyizin, derketine holê. Bi rastî rewşenbîr jî, polîtîka jî ne leyistikên canbazî ne. Her pişê karekî taybet û kedekê mezin ya çîlekeşî dixwaze. Jixwe mirovên ku destên wî di nava hevîr de, wîlo dest neşuştî dest bi polîtîkayê bike, ser û guh û çavên polîtîkayê jî wê tev bibe bi hevîr. Mîna mirovê bê destlimêj, li ser cilika limêjê raweste û dest bi limêjê bike. Kesê wisa ne adamîzad jê bawer dikin û ne Yezdan, (çiqasî mîhrîban û dilovan be jî) pê dixape.

Melkemat û hilma jiyanê

Mîna ku li cihekî komek hesin ji hev hatibe belavkirin, dema mirov mexnatîzekê dixê nav wan hemû perçeyên hesin dicivîne ser hev, welê jî mirovê mezin bi ked û xebata xwe ya giranbuha ew cendeka civand ser hev û du, wîze (enerji) da wî. Bi dayîna wîze re, cendek rakir ser piyan.

Cawa ku tîrêjên rojê li berbanga sibê derdikevin ser rûyê cihanê û ronahiya xwe vedigire ser tarîtiyê, wele jî Mezrabotan tovên mirovatî û şaristaniyê di nava dilê Rojhilata Navîn de geş dikir. Xwediyê vê axê bi zanistî û dewlemendiya çanda ku mîna şaxên dara çînarê li sê parzemînan dirêj dikir û damarên xwe berdida nava wan. Bi berfirehkirina çanda xwe re yekîti û biratiya gelan dida avakirin. Ji ber ku civata wan li ser ola Zerdeşt dimeşyan. Lewre ola wan mirovatî û xweşikbûn diparast.

Xweşikbûn û dewlemendiya vê herêmê bala her kesî dikşand ser xwe. Ji ber ku di vî warî de xuşexuşa ava çeman bû. Ew avên şêrîn ku giyan dida axê û der û dorê xwe, bi hêşînayî dixemiland. Çemê Firat û Dicle ji nav dilê vê axê derketibû û cihên tê re derbas dibû bi darên fêkiyan, çînar û berûyan bi rengê xwe, xwezayê ji erezyonê diparêzin. Binerdê wê tîjî zêr û zîv, sererdê wê jî ji axa sor ya mîna henê ku her cure zerzevat lê dihate çandin û ji bo mirovan jiyan dewlemend dikir.

Bi çiyayên xwe yê bi heybet û çar demsalan dihate xemilandin. Her yekî dilxwaziya azadiya xwe li wan çiyayê asê digirt. Girîngiya riya xwe ya bazirganiyê ji çûyîn û hatina sê parzemînan re dibû pira; ji ber vê yekê herkesî dixwest ku wê herêmê bixin bin destê xwe. Lewre xwediyê xwe jî çiqas derfetê jînê û mirovatîyê hebûn, diafirandin û didan parastin. Qet bi tu carî çavên xwe bernedidan talan û berhemên gelên din. Ji ber ku dilê wan hatibû dagirkirin bi hezkirina ji mirovatîyê. Bi dilê xwe yê paqij û zelal tim parêzkariya wî giyanî (ruh) dikirin. Lê mixabin sewalên hov jî hebûn li wê herêmê. Ew bi çavên xayîntiyê nêzikî xwediyê wê herêma dewlemend dibûn. Wan bi çavnebarî, bi hovîti, bi çavbirçîbûneke mezin û bi qurnazî wek sewalên har êrîş birin ser vê bihuştê. Bi durûtî û derewkarî ew bihuşt xistin bin destên xwe. Ew warê ku tova mirovatîyê lê hatibû şînkirin, kirin mîna xaniyekî kavil. Wekî ku tê zanîn her zindiyek bi tiştêkî xweşik jiyan dibe. Gulîstan bi avê tê jiyandin Mirov jî, bi jiyaneke serbixwe û azad dijî. Dema av li ser gulîstanê bê birîn, ew hişk dibe, ji ber ku hemû derfetên jiyanê li ser tîrê birîn.

Bi windakirina bihuştê, jiyan jî ji dest çû

Ji roja ku ew bihuşt hate wêrankirin û mirovên wê azadiya xwe windakirin û vir de xweşikbûn û çelengiya wekî gulan winda bûn. Bi windakirina vê rindiyê re, nexweşiyên giran di dilê mirovên wê herêmê de çêbûn. Ew roj bi roj lawaz bûn, bûn mîna cendekê li ber mirinê. Ji xwe

cendekê li ber mirinê hemû organên wî bêlebat dimînin. Ji ber ku ew rihê axtîf jê tê kişandin. Lewre ew bê mêjî, bê raman, bê dil bê çav, bê hêvî û bê jiyan dimîne. Ew cendek, ji kontrola mêjiyê serbixwe derketibû. Warê wî dihate hilweşandin, wî nikaribû xwe ji ber vê wêrankirinê biparasta. Ev jî bûbû sedema windakirina hêz û yekîtiya wî. Bê pergal dimeşiya, mirovên herêmê bûbûn mîna pelgên daran ên ku li ber bayê difirin.

Sewalên hov dev ji cendek bernedidan. Ji her hêlê ve rûmet û qencyên wî ji xwe re talan dikirin. Ji çar hêlan ve xwîna wî mîna qiradan dimêtin. Mêjî di serê wî cendekî de hebû, lê ne mêjiyê wî bû.



Nikarîbû bi ola Zerdeşt bifikiya. Ramanên mirovên herêmê hebûn, lê ew bi ramanên hovan diponijîn. Nikarîbûn xweşikbûna herêma xwe bînin zimên. Çavên wan, rastiya ku tê de dijîyan û rewşa xwe ya mirinê; ew zarokên wan ên bi ser sungiyan ve, keç û bûkên wan ên ku xwe ji ser zinaran diavêtin xwarê bînin zimên. Bi dil bûn, lê nikarîbûn birîndarên xwe di dilê xwe de derman bikin. Guhên wan qêrîn û hawara dayikan nedibihîst. Ji ber ku çavkaniya jiyanê azad winda kiribûn.

Sewalên hov bihuşt Mezrabotan li pêş xwediyên wê dikirin zîndana kontiraya û ew ji wir didan bidûrxistin. Li dewsa tiştên xweş jehra xwe ya mirinê didan wan. Tama jiyanê jî li wan tal, tîrş û lê heram dikirin.

Ew cendek çiqas ji hev hatibe belavkirin jî, lê dîsa jî melkemat dev jê bernedida. Tîrsa wî ew bû ku careke din rapêrînan li dijî wî pêk bînin. Ew tîrs jî dibû sedema nerehetiya jiyan û psikolojiya melkemat. Ji ber vê yekê dixwest hilma wî ya dawiyê jî jê bikşîne. Ji xwe cendek di êş û janeke giran de bû. Ronahî li pêş

wî bûbû tarî, êdî warê xwe jî nedidît. Bi xwe jî nizanibû; gelo ew heye an na. Gelo dîsa jiyaneke wekî berê bibe para wî an na. Wê warê Mezrabotan mîna berê were geşkirin. Ev jî wî ra xeyalek bû. Êdî ne moral, ne jî bawerî pê re mabû.

Hatina mirovê mezin û geşbûna ronahiya

Gava melkemat destê xwe yê qirêj kir qirika wî, cendek got: "Stêrka min ri-jiya. Ev qedera min e." Çavên xwe girtin û bi hêrs xwest hilma xwe ya mirinê bistîne. Bi kesereke kûr bêhnek kişand nava kezêba xwe. Êdî cendek di nav lepê melkemat de bûbû mîna şikefteke tarî. Çawa ku kuneke zirav di şikeftê de hebe û tîrêjên rojê xwe berdîna nava wê tarîtiyê, mirovê mezin jî welê mîna wê tîrêjê xwe berda nav rihê cendek. Mirovê mezin nehişt ku cendek hilma mirinê bistîne. Şûrê tûj ji kalan derxist û destê melkemat yê ku li qirika cendek hatibû şidandin jê

riyan paqij kir û jiyanê nû nîşanî wî da. Piştî wê zahmetkêşiya giran, êdî cendek bi mêjiyê nûjenî li ser bîngeha bi şewq, kesayeti û armanca xwe nas kir. Bi ramanê xwe ew xeyalên çewt dan xerakirin. Di şûna wan da ramanên dîrokî dikirin rastiya jînê.

Mîna ku li cihekî komek hesin ji hev hatibe belavkirin, dema mirov mexnatîzekê dixê nav wan hemû perçeyên hesin dicivîne ser hev, welê jî mirovê mezin bi ked û xebata xwe ya giranbuha ew civand ser hev û du, wîze (enerji) da wî. Bi dayîna wîze re, cendek rakir ser piyan. Cendek her çiqas radibû ser piyan, qeliştêkên fireh û kûr di bedena melkemat da vedibûn. Ji ber ku dest bi gavên azadiyê dikir. Lewre ew ji rewşa mirinê derdikeşt û dîsa dibû xwediyê Mezrabotan. Lê, vê cara dibû xwediyê zana ku kes nema bikaribe wî ji xwe re bide xebitandin û bike navgîn. Civata vê herêmê ji nû ve berhem û rûmeta welatê xwe dicivand ser hev û derdixist holê. Ji ber ku ew şewqa ku hatibû afirandin mîna sifreya Hz. İbrahim Xelîl e. Lewre tê gotin ku, li ser sifreyê her cure xwarin yê herî baş ji bo bijûnbûna mirovan heye. Di bin vê ronahiya bi rûmet de ji hemû çarenûsên xweşik ji bo kesyê mirovan heye.

Herêm bi hatina teyrên baz geştir bû

Teyrên baz li ser şopa vê ronahiya derketin qada cengê. Bi yekbûna xwe re artêşa neteweyî da lidarxistin. Ev artêş, bû serşoka azadiyê. Hemû qirêjiyên melkemat û ejderhayan di kesayeti mirovan de dida paqijkirin.

Xebata teyrên baz, mîna ava Çemê Zapê bi lez diherikî. Bi herikandina xwe re, wek Tofana Nuh hemû qirêjî û nexweşî derdixistin ser rûyê cihanê. Li dewsa wê gemarê hemû gewşîn (taybetî) û rêgizên (prensîp) mirovatîyê didan avakirin. Ji pêseroja mirovatîyê re ev ronahî dibe kevirê bîngehîn.

Melkemat, piştî ku ronahiya şax da li welatê rojê, kete rewşeke xerab. Hemû lîstok û rûreşiyên wî êdî derketin ber çavan. Xwediyê vê axê roj bi roj, damarên wî ji axa zêrîn da birîn. Ev jî dibû vemirandina hêviya melkemat ji welatê rojê. Li ser vê rewşê mîna cinawirên birîndar, dikir qêrîn û digot: "Min 28 caran serê wî da pelixandin û kir çar parçe. Çawa ew cendek ji nav lepê min rizgar bû û ber bi azadiya xwe ve dimeşe?" Lê belê bi qêrîn û hawara xwe êdî tu encam nedigirt. Lewra ew serîrakirin ne wekî yê berê bû.

Tovên jiyanê di bin şewqa mirovê mezin de hemû çavkaniyên jînê mîna volqanan da herikandin. Li hemberî pêla volqanê melkemat nema dikare xwe bigire. Çavkaniya jiyanê Mezrabotan, careke din xwe bi rengê keskesorê dixemilîne û bi şewqa xwe ronahiya li cihanê belav dibe.

AHMET HUSEYİN



- **23.06.1994:** Cîgirê Serokê Partiya Keda Gel (HEP) Ibrahim Încedursun, di Şerê Tekoşîna Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê deşehîd ket.
- **23.06.1996:** Di Kongreya HADEP'ê ya duyemîn de ala tirk hate daxistin. Ji ber ve yekê Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak û endamên meclîsa partiyê hatin girtin. Di heman rojê de, 3 endam û rayedarên HADEP'ê bi navê Hulusî Kul, Mehmet Kaya û Mustafa Öztürk, dema ku ji komcivîna vedigeriyan, li ser rîya Pınarbaşıya Kayseriyê ji hêla kontrayan ve hatin qetilkirin.
- **23.06.1972:** Seroka Giştî ya Partiya Karker a Tirkîyeyê (TİP) Behice Boran tevî 19 hevalên xwe hate girtin.
- **25.06.1950:** NATO'yê êrîş bir ser dewleta Koreyê

- **25.06.1994:** Li bajarê Frankfurt Almanayê 200 hezar mirovên kurdistanî meşek bi navê "Meşa ber bi Kurdistanê ve" li dar xistin.
- **26.06.1945:** Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (UN) hate damezrandin.
- **28.06.1934:** Zaro Axa di 159 saliya xwe de çû ser heqîya xwe.
- **28.06.1925:** Şêx Seîd, tevî hêzên xwe yên mayî di 27'ê avrêla 1925'an de li nêzîkê bajarê Muşê kete kemînê. Ew ji hêla leşkerên Tirk ve di hatin girtin. Piştê tevî 47 hevalên xwe hate darvekirin (daleqandin).

AWIR

Ahmed Arif li NÇM'ê hate bîranîn

Şükrü Erbaş: Ahmet Arif hê hêja û bi rûmetir dibe, Ahmet Arif di sala 1972'yan de xelas nebûye, Ahmet Arif heta sala 2072'yan jî xelas nabe û ji bîra helbesvanan dernameke û emê hê xurtir li Ahmet Arif û li azmûneriya wî xwedî derkevin.



YUSUF HAYALOĞLU

Li NÇM'ya Stenbolê roja 15'ê pûşpera 1997'an panelek li ser bîranîna helbestvan Ahmet Arif hate lidarxistin.

Di panelê de Şükrü Erbaş û Yusuf Hayaloğlu bi helbestên xwe reng dane panelê. Panelê bi giştî bi xwendina helbestên Erbaş û Hayaloğlu dom kir.

Pêşî Şükrü Erbaş der heqê jiyana Ahmet Arif de çend tişt bi bîr xistin. Der barê bîranîna Ahmet Arif de, Erbaş got ku Yalçın Küçük dibêje Ahmet Arif di sala 1972'yan de xilas bûye, tu girîngiya wî nêmaye. Erbaş li hemberî wê gotina Yalçın Küçük wiha got: "Ahmet Arif hê hêja û bi rûmetir dibe, Ahmet Arif ne di sala 1972'yan de xelas bûye an jî di nav civaka helbestvanan de cih nagire, Ahmet Arif heta sala 2072'yan jî xelas nabe û ji bîra helbesvanan dernameke û emê hê xurtir li Ahmet Arif û li azmûneriya wî xwedî derkevin."

Di berdeewama panelê de Erbaş û Hayaloğlu bi dorê çend helbestên xwe xwendin. Temaşevan gelekî di bin bandora helbestên Yusuf Hayaloğlu da

man, ji ber ku gelekî ji dil û can dixwend.

Şükrü Erbaş ji pirtûkên xwe yên bi navê "Dicle Üstü Ay Bulanık", "İnsanın Acısını İnsan Alır" û "Kül Uzun Süre" çend helbest xwendin.

Erbaş jî cara yekemîn ku li Yusuf Hayaloğlu guhdarî dikir, ew jî di bin bandora wî de ma û ji Hayaloğlu re "wallahî min nizanî bû ku hûn helbestan ev qas xweş dixwînin li min pir bandor kir", got.


Di dawîya panelê de me hin pirs ji Yusuf Hayaloğlu kirin, wî jî wiha bersiva me da: "Ez naxwazim ku navê helbestvanan derkeve pêş, ya hêja helbest e, ne ew mirove. Li ba me jî, hewce nake ku ez nav bidim, jî helbestan bêhtir navê şexsan derdikevin pêş, ev tişt ruhê helbestê dike û wê bêwate dike."

Wekî ku tê zanîn stranên Ahmet Kaya bi zêdeyî bi helbestên Yusuf Hayaloğlu ne. Helbestvan Hayaloğlu di pêşerojê de wê helbestên xwe di kasetê de bixwîne û pirtûkeke helbestên xwe jî piştî kasetê wê biweşîne.

AZAD ALTUN

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÛGÎT



Li ser formên şer

Giş dîroka şerên heta niha, dinasînin ku bi qasî şerê fizîkî; şerê şûr û mertalan, şerê tîr û kevanan, tank û topan, roket û fûzeyan şerê psikolojîk jî, şerê ruhî jî xwedî wezin e û bin çaran jî girantir e. Terefên di nav şer de li dijî hev ne bi tenê agir û barûdê, talan û xerakirinê, hilweşandin û herîvandîna, belê gelekên psikolojîk jî mîna moralxerabkirinê, hezîm û panîkê, şawşaw û hwd. jî bi kar tînin.

Ev şer e, minet tê de tuîne. Çi ji kê tê dîke. Yek li hêsir û girîyê aliyê dinanere. Ev rehîm e, ev wijdan e, ev xêr e û ev guneh e, nizanîm heye, nestêle ye şer li wan nanere.

Şer febrîka kuştinê, mekîneya xerabkirinê û aşeke ku bi laş û serê mirovan digere. Kesê ku van nizane, nehayîdarê wê ye, ji şer bêxêber e û bi şaşî pekiyaye nava şer.

Helbet şerê heq û şerê neheq hene. Di şer de terefê heq û yê neheq heye. Terefê zilimkar, zordar û çavsor heye û terefê biheq, mexdûr û li dijî zilmê heye. Aliyek dixwaze zilm û çewsandîna bidomîna û aliyê din hewl dide ku wan rake.

Heger em ji awira şerê li welatê me heye ve, em pîrsa şer hêlsengînî, bi dîlniyayî em karin bibêjin ku em aliyê heq in, em aliyê mexdûr û li dijî zulmê ne. Di vê çarçoweyê de û li ser vê bîngê şerê me pîroz û muqedes e. Yê dagirker û altaxên wan qirêj û gemar in û li dijî mirovayetiye, demokrasîyê û azadiya însan in. Her wiha berpîrsên şer û xwîna ku dirije, daristan û çiyayên tene şewitandin, tehb û xwêdana însan ya bi hezarên salan ku bi avê de diçe û nehîb dibe ne em in, belê desthelatdarên tirk, ereb, faris û dûvikên wan ên di nav me de ne. Yê gunehkar û tawanbar ew in.

Em bîna ser şerê psikolojîk û der barê wî şerî de jî çend gotinên din bikin. Her carê şer û nemaze şerê psikolojîk jî bo neteweyêkê, sinif û partiyekê şiklek îmtîhan e, îmtîhanek cidî ye. Netewe û rêxistina di vê îmtîhanê re derbas, nebe qels e, tim dikare biterpile, bikeve û bikumuşe. Neteweyê bi qasî şerê fizîkî di şerê psikolojîkî de jî ne xurt be dişkê, şer wînda dike. Şikestinên li başûrê Kurdistanê li ber çavan e. Ku Sedam dengê xwe li wan dike, ez hatim dibêje. Ewîl serok û kadroyên siyasî û piştê jî yê mayî dibêjin ling bavê min ling. Dawa xwe dixin devê xwe û yellah. Heger ne ev aliyê psikolojîk bûya, dibe ku Sedam niha ne li ser hikum bûya û kurdên Başûr jî li cihêkî din bûna.

Di şer de carinan şerê psikolojîk û carinan jî şerên fizîkî derdikevin pêş. Carinan fêra wî alî û carinan jî fêra aliyê din giran dibe. Yek ya din xurt û di şer de her tim ne tîving û çek e ya xwedî gotin. Belê bi qasî çek û çekdariyê qerardarî, îrade jî carinan dibin xwedîyên gotina dawî. Dema şerê psikolojîk gur dibe, baweriya qewîn, îmana xurt û saxlem in tiştên ku neteweyan li ser piyan dihêlin û bi ser dixin. Helbet psikolojiya neteweyî di şer de bi taybetî pir girêdayî psikolojî û morala serokayetiye, şervan û qomûtanan, kadroyên siyasî û mirovên hişyar ên li welat û derveyî welat e. Kurd bi saya şerê paş 84'an di giş cebheyên şer de bûna xwedî tecrûbe û êdî çavên me ji me dibirin ku dijmin dê hew karibe piştê me deyne erdê.

"Xwedê bela xwe bide hunermendên ne şoreşger"

Em hunermendên şoreşger in

Em vê hefteyê jî hevpeyvîna xwe ya bi komek ji komên kurdî, Koma Amed re ku hefteya borî dest pê kiribû, didomînin.

Hûn dikarin bibêjin em bi ser ketine; an jî muzîka kurdî li vir çi qasî bi ser ketiye?

● Fikri: Li ser navê kurdayetiye gelek hunermendan, zirar dane hunera kurdî.

● Süleyman: Koma Şirvan bi muzîka straneke gelêrî, bi peyvên li ser şoreşa îro, ji xwe re cih vekir. Encax îro veqetînek heye, sazî vê riyê digirin. Saziyên neteweyî rê li ber kesên ku wiha dikin digirin, yên ku guh nadin îqazan têtên teşhîrkirin. Yên di nav saziyan de bin jî dema ku çewtîyan bikin, têtên îqazkirin.

Li gorî min jî bo pêşketina muzîka kurdî aliyekî girîng jî avabûna MED-TV'yê ye. Çawa ku rêxistineke îstîxbaratê wezîfeyeke gelêrî dibîne, MED-TV jî pencereya kurdan e, hem kurdan nîşanî kurdan dide, hem jî nîşanî dinyayê dide. Dibêje: 'Kurdno hûn ev in' hem muzîka arebesk, hem a raq' derdixê. Di vê mijarê de belkî di dinyayê de televîzyona herî demokrat e. Pir kesan gotin 'ev neheqî ye.' Li vir li gorî min tiştêkî pir muhîm çêbû; reş, spî, qehweyî, zer û mor jî hev kişf bûn û gel notên wan da. Gel ev jî dît ku bi tenê Şivan Perwer nîn e, an jî qîmeta Aram Tigran fêhm kir. Îro muzîka kurdî ji çarlepikan xelas bûye, hêdî hêdî bi ser lîngan dikeve. Berê mirovek, 10 salî, 20 salî dixebitî jî ji nav sînorên bajarekî nikaribû derketa. Lê îro ne wisa ye, dengê wan digihêje her derê dinyayê, divê em pir bi baldar bin.

Li derveyî Tirkiyeyê jî komên muzîkê û muzîsyen hene, lê bi qasî yên hundir ne serkeftî ne, gelo ev jî ber çî ye?

● Ergin: Ji ber ku ew ji axa xwe dûr mane, ji insanên xwe dûr in. Hûn li ku bin bila bibin, dema dûrî welat û şoreşê bin, hûn nikarin hemû hestên gel bînin zimên.

Kesên ku li Almanyayê dijîn, li Swêdê, li Belçîkayê dijîn jiyana wan ji ya kesên li hundir dijîn pir cihê ye. Nihêrîna wan a li têkoşînê jî cihê ye, serhildana wan jî cihê ye, ji pir tiştan dûr in. Kesê li vir hûn zêde nêzikî gel e, germa-hiyê dide gel.

Hunermendên kurd ên ku li Ewropayê dijîn bi piranî, bi amûrên kurdî distirên (wekî Şehrîbana Kurdî) hûn vê çawa dibînin?

● Ergin: Heke hunermend çawa ji vir çûbe û li wir jî wisa mabe, muzîka xwe wisa çêdike. Heke cihê nefikire, wê wisa be. Heke cihê bifikirin wê guherîn di muzîka wan de jî wê çêbibe.

● Mustafa: Tembûrê baş lêxe an jî baş lînexê, ev jî bîngeha çanda wan tê. Di dawiyê de li Ewropayê be jî, li Tirkiyeyê be jî wê wî tiştî bike, an jî di nav NÇM'ê de be, ev girêdayî wî ye. Jixwe armanca saziyan jî pêşî, li tiştên wisa girtin e. Hinek jî ev ji demokratbûna MED-TV'yê tê ku her kesî derdixîne televîzyonê.

Gel pir eleqe nîşanî konserên we dide. Gelo ev jî ber muzîka we ye an jî ber ku hûn stranên gelêrî pêşkêş dikin; an jî tiştêkî din heye?

● Ergin: Min berê pêşîn gotinên stranên nizanibû, pişt re hûn bûm, di stranên de îsyân heye. Belkî di strana 'Haynik na' de qala kûçikekî dike, lê ew li ba min wekî straneke ku ji bo gerîla dibêjin tê. Di awaza stranên de îsyân heye ew jî vê tê.

Yanê ji stranên e?

● Ergin: Na yanê awayê gotinê, awayê muzîkê, awayê tembûran her tişt.

● Süleyman: Dema ku me ev kaset çêkir, mebesta me ne pir-fîrotina kasetê bû, helbet pir

fîrotan muhîm e, gihîştina pir kesan muhîm e, mebest bazirganî nîn e. Komeke ku di sala 1988'an de ava bûye ji aliyê pir kesan ve tê nasîn, fîrotina kasetê 40-50 hezar e, serkeftineke mezin e. Li gorî min, pir hindik e. Kaset li pir cihan nayê fîrotan, nakeve Kurdistanê, li pir cihan daliqandina afîşan qedexe ye. Tevî van astengiyên siyasî, ev du sal in kasetên ku derketine bi qasî nivê kasetaya me nefîrotin. Ev hem ji nasdariya Koma Amed tê û hem stranên me jî pir xurt in, me jî yên xurt derxistin pêş, ji vir jî tê.

● Fikri: Rast dibêje, ne reqemeke mezin e. Kasetên bi vî rengî yên ku berê derdiketin, hindik fîrotin; wekî Koma Dengê Azadî, Koma Agirê Jîyan ku di du mehane de 50 hezar fîrotin pir kêr e, heke em girseyê bifikirin ne baş e.

● Mustafa: Em li Tirkiyeyê dijîn, divê em ji mozaîka gelan îstifade bikin û bîngeha xwe bîafirînin. Ez firehbûna pêvajoya muzîka kurdî baş nizanîm lê, di vî warî de şexsiyetên navdar gelek in. Her wiha miheqeq bi têkoşînê re muzîk jî bi pêş ve diçe. Em hunermend in, divê xebata me di xizmeta gelê kurd de be. Divê li dengbêjan were guhdarkirin, sêfonî bêne çêkirin di her warî de, muzîka kurdî dewlemend e. Divê em haydar bin ji van yekan.

Di rojên pêş de emê Koma Amed çawa bibînin gelo?

● Fikri: Ne bi tenê Koma Amed, îro komên ku di bin banê NÇM'ê de cih girtine tevahiya wan jî, bi pêşveçûna Têkoşîna Rizgariya gelê kurd û xwedîderketina gelê kurd ve girêdayî ne. Têkoşîn çiqas pêş ve here, wekî her saziyên kurd, wê NÇM û Koma Amed jî pêş ve here. Îro li welatê me, zilm û zehmetiyên giran tene dîtin, her çiqas komên

NÇM'ê (em jî di nav de), bixwazî çand û hunera kurd bi pêş ve bibin, nikarin xwe ji van rastiyên gelê kurd dûr bixin. Helbet wê ev zilm, zehmetî, kuştin, talan û hwd. bibin helbest, klam, şano û pirtûk. Pêşveçûna me bi van yekan ve girêdahî ye. Divê endamên koma me, tu car xwe ji rastiya gelê kurd dûr nexin.

● Ergin: Ez bawer nakim ku îro huner û hunermendên kurd, li pêşiya gel dimeşin. Lê divê bimeşin. Îro gelê kurd di şert û mercên giran de ne. Di vî warî de divê mirov ji bo gelê xwe, xwe feda bike, xwe bike sed perçe, di riya gel de bimire. Dema ev tişt çêbûn ew çax mirov dikare bibêje bihevrebûna gel çêbûye û em jî nêzikî rastiya gelê xwe bûne. Tabî ev yek bi rêxistinbûnê ve girêdahî ye.

Tengasiyên we çî ne, di warê xebatê de, mesela hûn li derve dikarin konseran bidin?

● Süleyman: Tengasî û zorîyên 20 sal berê û îro ne wekî hev in. Dijwariya herî girîng zehmetiyên hunermendên kurd, em jî di nav de, dibe ku gemariya wî be, dibe ku hepsa di mejiyê wî de be. Ji bilî vê tu tengasî tune ne. Endamên me tev îşkence dîtine, saziyên wan hatine dagirkirin hem jî her roj heqaret dîtine, lêdan û gef xwarine, gotine "tu çî karî dikî?" Gotiye "ez hunermend im, xwestine ku wî ji halê hunermendiyê derxin.

Îro nikarin ji helbest-nivîsandina min re bibin asteng, ji konserên me re dikarin astengiyên derxin, lê nikarin rê li ber çêkirina besteyên min bigirin. Dibe ku em nikaribin konseran bidin, lê em diçin daweta malbateke welatparêz, em ji 300-500 kesî re têkoşîna gelê xwe dibêjin. Belkî rê li ber konserên me bigirin, lê televîzyona me MED-TV xîtabî 20 milyon kesî dike, em tê de derdî



Fikri



Serab



Mustafa



Ergin



Turan



Süleyman



Ahmed

Kesên hunermend û di serî de jî kurd, dema ne şoreşger be, Xwedê bela xwe bidê!!! Dev ji hunermendan berdin di şert û mercên îro de divê her kurd şoreşger be.

Tiştê xweş, baş, spehî jî bo mirovahiyê hene. Huner jî yek ji van xweşikahiyan e. Eger huner xîtabê mirovên xweşik, baş û spehî neke, tu tişt îfade nake jî bo me.

kevin, ev ji bo me tiştêkî mezin e. Ew bi saya kê çêbû? Helbet bi saya Şoreşa Kurd çêbû. Di rojnameyên xwe de em xwe dibînin, bila qet çapemeniya burjûwa behsa me neke, ne xem e. Di warê teknîkî de me gelek tengasî ji holê rakirine. Êdî dema girîna kurdan û hunermendên wan boriye. Tengasiya me bi tenê di warê 'şexsiyeta qirêj' de maye, divê em vê jî ji holê rakin. Bila kes nebeje 'pereyên min tune ne, gel jî pereyan nade min' na ne wisa ye, gel dide.

● **Fikri:** Me kaseta 'Kulîlkên Azadî' bi awayekî qanûnî derxist. Tabî wê demê qedexeya kasetên kurdî hebû. Em ketin studyoyê, jixwe em tev xwendevan bûn, 5 ji wî, 10 ji yên din, 50 hezar ji yekî din... bi vî awayî me xwediyê studyoyê xapand û me kaseta xwe di wan şertan de derxist.

● **Süleyman:** Ez dixwazim vê yekê bibêjim. Bi hezaran kurd dixwazin tyatro-yê çêbikin, stranan bibêjin, gelek kes hene xwe gelekî bi qedr û qîmet dibînin. Rojê 9-10 kes têne NÇM'ê dibêjin 'ez, ez û ez' ez dixwazim kasetekê çêbikim. Yanî dixwazin zû bi zû meşhûr bibin, bi tenê kula wan ew e. Em ji ber vê yekê dibêjin tiştê ku hûn bikin baş e, pîroz e, lê heger bi gel re be bi qedr û qîmet e.

Îro pîrsgirêkên me zêde tune ne. Lê pîrsgirêka zanîngeheke kurd heye. Divê konserwatûwarek hebe, dibe ku di damezirandinê de tengasî derkevin, lê mirov dikare bi ser bikeve. Hinek kom û kes hene ku di nava gel de hunera xwe pêşkêş dikin. Ev tiştêkî ne baş e. Li vê derê ez bang li wan kesan dikim, bila werin di bin banê NÇM'ê de cihê xwe bigirin. Wê çaxê wê bi pêş ve jî herin. Îro derfetên me ji Unkapaniyê deh car zêdetir in. Ji ber ku gelê kurd li pişt me ye. Em xwe bi gelê xwe re azad û serfiraz dibînin, ji ber ku em bi wan re dike-nin û bi wan re digirin. Eger nanekî gel ji bo xwarinê hebe, ew ji bo me ye jî, îro em dikarin li mala her welatparêzî bimî-nin, ew bi xwe dibêjin, di çadirê de be jî dixwaze ez li cem wî bim, ev ji bo me rûmeteke mezin e. Ez pîr tême naskirin ango ez kesekî pîr navdar im? Na!

Gelo hunermend an jî hunermendê kurd divê şoreşger be?

● **Serap:** Kesên hunermend û di serî de jî kurd, dema ne şoreşger be, Xwedê bela xwe bidê!!! Dev ji hunermendan berdî di şert û mercên îro de divê her kurd şoreşger be.

Tiştê xweş, baş, spehî ji bo mirovahiyê hene. Huner jî yek ji van xweşikahiyan e. Eger huner xîtabê mirovên xweşik, baş û spehî neke tu tişt îfade nake ji bo me. Gotineke Victor Jara heye pîr li xweşa min diçe, dibêje: "Mirov danake-ve asta gel, hildikişe"; Em jî dema bi vî awayî bin, dema em bi gel re bijîn wê çaxê em dikarin ji xwe re bibêjin hunermendên baş, paqij û xweşik. Hunermend xewna xwe jî-divê bi gelê xwe re bibîne. Heger ne bi vî şeweyî be, ez dibêjim tiştê ku dixwe jî, bila jê re bibe jehr û zîqûm.

Ez werim ji we re bibêjim, ez dikarin li tembûrê xim, hûnê min hildine nav Koma Amedê?

● **Süleyman:** Bi tenê tembûr bikaranîn têrê nake. Ji bo hunermendbûn ev têrê nake. Mesela ez nizanîm li tembûrê



Endamê Koma Amed yê li Ewrûpayê Memo, Merdan, Serhad û yên li Tirkîyeyê Serab û Fikri bi hev re dixuyên.



Li aliyekî amûrên muzîkê yên gelêrî, li aliyê din amûreke rojavayî gîtar. Ev ji bo navneteweyîbûnê gaveke girîng e, ji bo muzîka kurdî.

bixim. Lê di nav gelê me de hin kes hene ku bi awayekî profesyonelî û xweş li tembûrê dixin lê ew nayên NÇM'ê naxebitin.

Pîvana vê yekê çi ye?

● **Serab:** Koma Amed, ne koma min û te ye. Ne koma Silêman û Serab e jî. Koma Amed koma gelê kurd e. Heger

gel bixwaze dikare vê komê bixe binê erdê, dikare çavê wê derxe û dikare derxe ser asîmanan jî. Heger kesek rahije tembûra xwe, were bibêje ez dixwazim di Koma Amed de bixebitim, heger bivê cihê wî li ser serê me heye. Lê heger dirust be.

Hûn hunermendên başûrê Kurdistanê çawa dinirxînin. Seîd Yûsiv û

Mahmud Ezîz hatin Tirkîyeyê gelek konser jî dan, di derbarê wan de hûn çi difikirin?

● **Fikri:** Ji ber ku hatin bakur, ev niyeta wan a baş nişan dide. Gelê başûr li gor bakur di warê çand û hunerê de xwediyê derfetên baş in. Mesela çûne zanîngehên xwe, konserwatûvaran û hwd. ji ber vê yekê jî, li vê derê dixwestin xwe derxin pêş, dixwestin meşhûr bibin, pera qezenc bikin. Ew gelek di bin tesîra kapîtalîzmê de jî mabûn li gorî min.

Mesela digotin "wan kesan ew qas helbestên min bi kar anîn, lê pere nedan min."

Mehmûd Ezîz bû mêvanê min. Dema hat mala min, wê gavê digot "tu çiqas meaş distînî, ez ew çend pere distînîm, doxtorên me ew qas distînî û hwd.

● **Süleyman:** Hunermendên Başûrê Biçûk û Başûrê Mezin, bi rastî jî muzîka xwe gelekî baş çêdikin, ji muzîkê, ji çandê fêhm dikin, di warê muzîkalî de pêşketî ne, konserwatûvar û zanîngehên wan hene, ev xalên girîng in, dibe ku îro baş nexebitin. Lê mixabin ew ne politîk in. Ev kêmasiyê mezin e. Pêşengiya gel nikarin bikin. Eger ew huner û politîkayê binin cem hev, wê werin cihê gelekî baştir. Mesela solîstê me yê yekemîn di nav Têkoşîna Kurd de cih girt û şehîd ket. Xwezî îro bêhtir ji wan di nav me de hebûna, di vî warî de em ji hev baş îstifade jî nakin, ev jî kêmasiyek e.

Gava kaseta Ciwan Haco "Dûrî" nû derketibû, bi rojan di medyaya burjûwayê de cih girtibû, lê dema mirov dêhna xwe dide kasetaya we, ji wê kasetê ne kêmtir e. Lê medya guhê xwe ji wê re girt, sedem çi ye?

● **Süleyman:** Burjûwazî zane îro kî kî ye. Zane Ciwan Haco jî û Koma Dengê Azadî jî kî ye û çi ye? Mesela Kovara Aktuelê diçe bi 'Koma Dengê Azadî' re hevpeyvîne dike, lê bi kom û hunermendên NÇM'ê re hevpeyvîne nake.

Ev yek ji ber NÇM'ê çêdibe, an jî ber tiştêkî din e?

● **Süleyman:** NÇM şaxeke Têkoşîna Rizgariya Gelê Kurd e. 400 xebatkarên wê hene, bûye sazî. Ev yek ji bo burjûwazî kelemên çavan in. Ev yek li xweşiya dewletê jî naçe. Çapemeniya burjûwa, ji bo ku me nebîne, çi ji destê wê tê dike. Ez mînakekê bidim. Ji televîzyoneke tirkî, bernamevanekî navdar, li NÇM'ê digere, ji bo komekê kurd ji derveyî NÇM'ê ku muzîka raq (Rock) çêdike, telefona wan ji me dixwaze ku bi wan re hevpeyvîne çêbikin. Wê komê jî di 7 salan de 2 helbest çê kirine. Em dibêjin yawo bi me re bikin em ev in, dibêjin em dizanin, lê ji bo rojeke din, ji bo bernameyêke din.

Tiştê ku me nepirsî, ku hun bibêjin hene an na?

● **Süleyman:** Belê me berê jî bang li hunermendên bêrêxistin ku bi serê xwe teverê dikin kiribû, em banga xwe dubare dikin: Bila werin em bi hev re bixebitin. Komên nû çêdibin, bila ew jî werin bikevin nav van koman.

Tiştêkî din jî, em naxwazin ku Koma Amed bi 6 kesan bi sînor bibe. Me divê 60 kes bin, anjî bila gelek Koma Amed çêbibin.

HEVPEYVÎN: M. AKSOY

Binefşa Narîn û Cembeliyê

Mîrê Hekarî -I-

Cembeli mîrê herêma Hekariya ye; girtin, stendin, ferman, berdana bajarê Hekariya temam bi destên Cembeli tê kirin. Cembeli mirovekî pir delal e, pir ezîm û pir helîm e, mirovekî bi qonax e, nandar û navdar e. Di nava herêma Hekariya de mirovekî xwiya ye. Ji heft saliyan heya heftê saliyan hemû kes jê hez dikin û qedrê wî digirin, navê merdbûn û mîrxasbûna Cembeli li her derê belav dibe. Li her herêmê her kes nav û dengê Cembeli dibihîze.

Omo jî serkarê nava mala Cembeli ye. Girtina xulam û xizmetkaran tev bi destê Omo ye. Omo mirovekî pir helal û pir rast e, bi mîrê xwe ve jî pir girêdayî ye, dema li mîr biqeside û çî xwesteka wî jî mîrê wî hebe mîrê wî jî tu texsîratîyê jî "Omo re nake. Omo ji kîjan xulamî hêrs bibe wî jî xulamîyê dide derxistin; jî kîjanî jî hez bike wî dide mezinkirin. Lê belê Omo bi eslê xwe mîrîtîyê, hemû mîletê êlê jê re dibêjin Aşiq Omo. Bila Omo bi mîrê xwe Cembeli ve li Hekariya bimînin, em werin dora Binefşa Narîn:

Binefşa Narîn qîza Fariz Begê ye; Fariz Beg axa ye, heft lawê wî û qîza wî Binefş hene. Êla wan êleke pir mezin û pir giran e. Dewrêş Beg biraziyê Fariz Begê ye û axayê êlê ye. Her tiştê êlê bi destê Dewrêş Begê ye. Roj diçin, meh derbas dibin; rojekê sibê zû, Dewrêş Beg radibe nimêja sibê. Bala xwe didê qîzek li pêşiya kon sekiniye, li ser çîte cilan radixe. Ew keçik Binefşa Narîn e. Sibê zû rabûye cil şuştine, sing û berên wê tev vekirî bûne, zend û bendên xwe hilçinandiye û li ser şiritê kinca radixe. Sira sibê li nava çavên Binefşê dixê, çûncika nekîrî bi ser çavên wê de tê. Gava çavên Dewrêş bi Binefşê dikeve, Dewrêş dixerike û dikeve erdê. Di navê re dem derbas dibe, roj tê taştîyê, xulam bala xwe didinê Dewrêş Beg nehatiye. Radibin li vî alî, li wî alî digerin û gava Dewrêş Begê dibînin, bala xwe didinê ku Dewrêş Beg xeriqiye, xwîn li ber meyaye. Dewrêş radikin, av diavêjin nava çavên Dewrêş, hişê Dewrêş tê serê Dewrêş. Dema Dewrêş li der dorê xwe mêze dike, bala xwe didê roj hatiye nîvro, qîzika çî, halê çî. Wê çaxê gazî xulama dike û ji wan re wiha dibêje:

De lorî lorî lorî
De komê xulama bi qurban dilê min dibêyo
Li kubara sibêyo
Minê qîzek ditîbû li ber konê çit û perdêyo
Qîzik wisa bedew bû mîna leka orta hîvê yo
Zîwana dora rojêyo
Qirika keçikê dişixule mîna şûşa lambê yo
Çavên keçikê mîna dara spîndarê yo
Awaz awaz şewle dide li dinê yo
Ji bo xatirê çavên wê keçikê eqil û
sewda nemaye
di serê min de li vî derê yo
Hûn didin xatirê Xwedê yo
Ka ev qîza, qîza kê yo û ji mala kê yo

Wê çaxê xulam ji
Dewrêş Begê re
dibêjin: "Axa-
yê min, bi
Xwedê
e m
v ê



ke-
çikê
nas na-
kin, tu here
aliyê herêmê
ji cariyê nava ma-
lê pirs bike, heger ew
nas bikin." Dewrêş ji wir berê
xwe dide aliyê herêmê, temamî cariyên li
hev kom dike û ji wan re waha dibêje:

Komê cariya qurban dilê min dibêyo
Ez ê serê sibê rabûm ji nava nivîna û
ji xewê yo
Ji bo bikim du rikat mîja sibê yo
Min hilda misînê ava desmêjê yo
Ez derketim derê malê yo
Min dît ku qîzek sekînbû li derê malê yo
Ez ê nizanîm navê vî keçikê yo
Şirikên guharê berdaye ser pozê
xizemî û qerefilê yo
Şirikê bîlezikê berdaye ser momika
tiliyê ber qaşa gustîlê yo
Keçik yeka pale pul e, naz nazerin e,
diçilwile li derê malê yo
Hûn bidin xatirê Xwedêyo
Ka hûn ji min re bêjin ka ev qîz qîza kê yo

Carî jê re dibêjin "Apê Dewrêş, ew qîzika ku tu dibêji ew qîza apê te Fariz Begê ye. Navê wê Binefşa Narîn e, xwişka

heft bira, tayê bi tenê ye. Dema
Dewrêş van tiştan dibihîze
dilê wî rihet
dibe û di navberê re
dem derbas

rin ez ji wan re bibêjim ka ew çî dibêjin?"
Bi vî gotinê re Dewrêş ji Fariz Begê re wiha dibêje:

De lorî lorî lorî
Apo dilê min dibê yo
De tu were bide min Binefşê yo
Apo ezê bidim te axatiya êlê yo
Ezê heft lawên te bizewicînim ji êlê û
ji emrê yo
Ezê bidim te malê xezîmê yo
Ezê bidim te kavirên ji bo firotinê yo
Ezê bidim te berxê kozê, miyê ser hozê yo
Apo eger tu nedî min Binefşê yo
Ezê bi te re bikevim herbê û cengê yo

Di pey van gotinan re Fariz Beg dibêje: "Dewrêş tu rabe here, gava birayên Binefşê ji nêçîrê hatin, emê bi hev bişewirin, piştî wê ezê xeberê jî te re bişînim."

Dewrêş radibe ji mala Fariz Begê xatir dixwaze û diçe. Dibe êvar birayên Binefşê ji nêçîrê dizivirin, ten li malê peya dibin û derbasî hundurê koşkê dibin, bi rêzê ve destên bavê xwe maç dikin, ti jê ra odê destên xwe li ber bavên xwe girê didin û li piya disekin. Bavê wan destûra wan dide, ew rûdinin, lawên Fariz Begê bala xwe didinê bavê wan bi made ye, lawên wî jê dipirsin dibêjin: Bavo xêre, tu çima îro bi made yî, kê qelbê te şikandiye?

Fariz Beg ji wan re dibêje: Lawo kesî qelbê min neşikandiye, lê belê lawê apê we Dewrêş Beg îro hatibû ku Binefşê ji xwe re bixwaze, min jî jê re got here bila êvarê birayên wê werin ka ew çî dibêjin; piştî wê, emê xeberê jî te re bişînin. Birayên Binefşê bi hev dişewirin û ji bavê xwe re dibêjin 'Minasib e'êger Binefş qebûl bike, emê bidin Dewrêş Begê. Dewrêş Beg lawê apê me ye."

Gava diçin cem Binefşê û meseleyê jê re dibêjin, Binefş dibêje:

- Ez Dewrêş Begê nastînim, belê lawê apê min e; lê hima di salên bavê min de ye.

Li ser gotina Binefşê, birayên Binefşê dibêjin:

- Em tev werin kuştinê jî te nadin Dewrêş Begê.

Fariz Beg di pey van xisedana re gazî lawên xwe dike û wiha dibêje:

De lorî lorî lorî
Lawên min hûn rabin bikin kar û
barên revê ye
Belkî em xwe xelas bikin ji destê
Dewrêş Begê ye
Hûn rabin dîregên kona berdîn li rîyê erdê ye
Bar bikin, barê deva têkevin serê rê ye
Hûnê kozê berxa dan bikin li nava
hozên miya ye
Bila karvanên me bikişê li serê rê û dirba ye
Emê xwe berdîn beriya Şikaka,
cem Cembeliyê Mîrê Hekarî ye
Lorî lorî lorî

AMADEKAR: SERVET YÜKSELİR



Li navendên çandê çalakiyên vê hefteyê

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● **22.06.97 Yekşem:** Ekîm Sanat Tiyatrosu: Carrar Ana'nın

Tüfekleri (Tivingên Dayika Carrarj", saet: 14.30

Konsera Murat Çelik "Ben aynı ben (Ez heman ez)", saet:18.00

● **25.06.97 Çarşem:** Semînera Înstîtuya Kurdî "Torî" - Di

dîrokê de bingeha çanda kurd, saet:18.00

● **27.06.97 În:** Filmê "1 Mayıs (1 Gulan)", saet:16.30

Filmê 'İş' (Kar) Derhêner Faik Ahmet Akıncı, saet:18.00

● **28.06.97 Şemî:** Konsera Koma Amed, saet:14.30

Belgefîlmê İsmail Beşikçi: "36 kitap=13 cezaevi (36 Pirtûk 13 Zîndan)", derhêner: Ahmet Soner, saet:18.00

Li NÇM'ya İzmîrê

● **22.06.97 Yekşem:** Şanoya Hêlîn "Bayê Elegezê", saet:14.30-18.30

● **27.06.97 În:** Programa bîranîna Şêx Seîd, saet:18.30

● **28.06.97 Şemî:** Roja xwarinên kurdan ên kevneşopî, konsera Ozan Hogir, saet:18.30

AWIR

Fîlmekî cihêreng



Belê di filmê "İş" de malzeme kêman in. Dîtinên siyasî û civakî kêman caran xwe didin nîşan. Lê dîsa jî mirov dikare bibêje di nav filmên ku li Tirkîyeyê hatine çêkirin de, ev film dikeve nava rêza filmên hêja. Di film de tîkiliya civaka kurd û tirk kêman bin jî, hatiye ziman.

Li Tirkîyeyê film çêkirin zehmetiyekê dixwaze, mijar her çî be. Derfetên çêkirina filmên bi qelîte pirsgirêkeke serbixwe ye. Her wiha Yeşilçama Tirkîyeyê navenda çêkirina filman e, lê tu carî li ser mijarên girîng ranewestiyê. Vê yekê ew her dem li dûv rojevê hiştine. Bi tenê li ser mijara namûsê film hatine kişandin. Mijar filmên ku hatine çêkirin jî bi giştî wiha ye: Yek ji yekê hez dike, bav keça xwe nade, heke bide arîşeyêke din derdikeve pêşberî wan, an jî keçikê bi serê xwe hatiye bajarê Stenbolê ketiye nav emelên nebaş an jî mijara qeremaniya Osmanîyan, wekî Kara Yılan, Kara Murat, Karaoğlan û hwd. bi teknîkeke ku yekî ji sînemayê dîr dixê, bi naverokeke vala ku mirov nikare li ser hin tiştan bibêje.

Belê di van demên dawî de hin derhêner û rêveber li ser mijarên siyasî ku gelên li Tirkîyeyê eleqedar dike radiwestin.

Filmê "İş" jî yek ji filmên bi vî rengî ye, ango filmekî li ser mijarên siyasî ye. Di film de Berhan Şimşek serlîstîkvaniyê dike. Bi giştî film li ser kesên bêkar hatiye kişandin, di

film de Îngilîstanî îhaleya çêkirina bendavekê li Tirkîyeyê distînin, kesên li derdora cihê bendavê, bi giştî jî gundiyan digirin kar, di film de mesajeke girîng bi awayekî veşarî hatiye dayîn. "Bi hatina Îngilîzan dijminatî dikeve navbera kesên li herêmê, bi taybetî jî ev dijminatî xwe li ser gundiyan bêhtir dide nîşan. Her wiha ji bo ku gundî di wê şirketa bi navê 'Wimpey' de bixebitin danûstandin û hevalbendîya di navbera xwe de xera dikin.

Belê di film de malzeme kêman in. Dîtinên siyasî û civakî kêman caran xwe didin nîşan. Lê dîsa jî mirov dikare bibêje di nav filmên ku li Tirkîyeyê hatine çêkirin de, ev film dikeve nava rêza filmên hêja. Di film de tîkiliya civaka kurd û tirk kêman bin jî hatiye ziman.

Her wiha ev film ji bo zanîna girîngiya bêkariyê û naskirina reaksiyona li hemberî împeryalizmê (her çiqas di film de bi awayekî zelal nehatibe nîşandayîn jî) hêja ye.

Ev film ji alî beşa sinemayê ya NÇM'ê ve roja 14.06.1997'an de anîn.

AZAD AVAŞIN

TÎŞK

LERZAN JANDÎLÊ



Xayintiya girse û qije

Zê dîroka şaranê bînan, dîroka ma de jî, xayintiyê biye û benê. Modem ke tebera niyado, şikîno, ke vaco: Ma se bikeme, her qom û şarî de xayînî û xayintiyê esta. Naye rê jî, ma de jî xayîn û xayintiyê esta.

Belka mesela ma jî hatanî na ca normal a. La belê meselaya ma hatanî na ca niya, avê şona. Demê klasîkî de, yanê demo ke zanayen û waştana şarîtiye çinebiye, her aşîre, her çê, her mezheb, her dîn ebi nameyê şarî, hama sêba xo ceng kerdene û yê bînan jî dûriya niya dêne, beno ke, na xayintiyê û xayînî zê normal biyamêne diyene, yan jî bêro diyene.

La belê, ê ma niya niyo. Payniya sedseriya 19'î ra hatanî emro/ewro ti vana qeyî na xayintiyê biya qederê ma.

Ma zaf dîrî meşîme 1919 ra na rêy tede niyadîme. Koçgîrî de xayintiya girse, xayintiya zerî biye, Şêx Seîd de xayînê girsî xayînê zerî bi. Dêrsim de xayîn û xayintiya girse, ê zerî biye.

Dem amê derbaz bi PDK amê avakerdene. Şarê ma hevîyê zaf hewlî ere na partiye girê dayî. Peyniye se bî?

Ez nê rojanê nazikan de nêwazena na der heq de zanayene nîşan dê, la belê ez wazena tenê biyanan biyarê re çiman ver û girêdayê naye bawariya xo vacî. Na partiye, ez nêvana Barzanî yan jî Barzaniyan, her çîra ver muhalefetê zerê xo ebi zor werte ra dard we. Na partiye hemverê PDK-Îranî ceng kerd, ebi emrê şahî gelê cengawerê na partiye kiştî. Na partiye dawa cengê kirmanciyê (Kurdistanê) rote Amerîka û Îsrailî. Her kes zano tîkiliyê na partiye ebi leşker û ajananê Îsrailî û Amerîka senên bî. Na partiye cengê azadiyê ma rot bi Baase û Saddamî.

Na partiye çêrd roşnabîrî, çand demdarî, çand cengawerî, çand welatparêzî kiştî? Luzum ken ke, ma na ca naman binivisnîme? Nê. Çimke her kirmanc naye zano. Eke nêzano jî ganî bimuso. Bimuso ke, dîroka ma ra, dîroka ma de xayintiya na partiye ra dersan bicêro.

Pêco se kerd? Şî Saddam maçî kerd! Xelata şarê ma, xelata Halepçê, xelata koçberiyê, dewamê rijiyayan, cêniyanê viyan, guretiyanê zîndanên û û û.

Beno ke gelê mordemî hatanî na ca jî normal bivînê. Hama nayera dime, yanê 1992 ra nat qe kes, hama qe kes nêşikîno xayintiya na partiye normal bivînê.

Şansê mawo tewr girs ebi destê naye amê verhewa kerdene. Naye se kerd? Ebi hetkariya îraqî YNK de ceng kerd, ebi nê cengî leşkerê Enfalî Helepce ra dime rêyna kerd Kurdistan. Na partiye şenikatîyane welatê ma ser ro zilm kerd, kesê asûrî, nemusilmanî, nebarzanî kiştî, yan jî biye sebebê kiştîna dînan. Na partiye ebi weştana Tirkîye, Îsrailî û Amerîka duştê tevgera azadiya welatî de politîka viraşte. Ebi naye jî nêvindete, 1992 rê nat çîqa ke firsend dî, êrîşê ser rê gerilayan kerd. Derba tewr girane, se ke leşkerê enfalî kerd welatê ma YNK de ceng kerd, na 26 rojî yo ke Kuliye moxolan kerdê welatê ma. Ê kulî wazenê, ke çike destra êno, bikerê. La belê bê feyde!

Ma ganî çîye xo vîra mekerîme!: Hatanî nîka eke qiyân xayintiya bikerdene, yan jî eke qijî xayintiyê bikerê, nê zaf xedar ênê cezakerdene.

La belê girsî, kesen ke wayîrê quwetê, xayintiyê bikerê kes angorê xayintiya nînan ceza nêdano, nînan. Ez bawer kena ke, welatê ma de dem, demê wumayêna nê mantîkî yo. Eke qijî bikerê! Guna dînan af û tobê dînan ra zafêriya. Ganî ma demê entazîfîzîrenî ra (şarî, qomî nazîyan ra temiz kerdene ra) derse bicime!

Ji Farqînê du lîstikên zarokan

Li her herêma Kurdistanê lîstikên zarokan cur bi cur û gelekî dewlemend in. Ez dixwazim ku di her herêmê de çiqas lîstik hebin derkevin holê. Em van lîstikan di pirtûkekê de bicivînin. Ji bo ku zarokên kurdan hem di nava civata zarokên cîhanê de serbilind bibin û hem jî van lîstikên xwe hînî gelên din bikin, da ku têkiliyên germ di navbera wan de çêbibin.

Em zarokên Farqînê dema em biçûk bûn, em ev lîstik dilistîn. Van lîstikan di navbera zarokan de têkiliyên pir germ çêdikirin û pir kêfxweşî dida mirovan.

Tendûra te de çî pijiya

Navê lîstika yekemîn "Tendûra te de çî pijiya" bû. Lîstik bi ji 4'an he- ta 10 kesaan tê lîstin. Carinan mezin jî tevli lîstikê dibûn, ji ber ku wan navê xwarinên xweş dizanibûn. Di nava lîstikvanan de serokek tê hilbijartin. Ev serok biwêjan (tekerleme) pêk tîne û lîstik dest pê dike. Hemû zarok destên xwe datînin erdê. Seroka destê ku li erdê pêj (dirêj) bûye, dihejmêre. Serok bi pêçîka xwe ya nîşanê yek bi yek zarokan dihejmêre û dibêje:

Hêkil mêkil, canim çêkil
Estiyê kewê, li bin mewê
Mêw qetiya, kew firiya
Ji hacika, ji macika
Eviya hilde, eviya paçîka

Tiliya nîşanê hat ser destê kê, ew destê xwe paçî dike, destê xwe dike kulm û di bin çengê xwe de germ dike.

Dîsa serok van gotinan ducar dike. Dema ku hejmartina hemû destan qediya, wê çaxê serok yek bi yek destê ku di bin çengan de germ bûne, derxistina wan ji zarokan dixwaze û destê wan digire, dîtî û fikra xwe dibêje.

Serok ji bo ku zarok kêfxweş bin navê xwarinê xweş dike û dibêje: "Himm te pir germ kiriye (kulm wekî tendûrê tê hesabandin) te çiqas xweş xwarina xwe pijandiye, pir bêhneke xweş tê, navê wê xwarina te çî ye gelo?" (Beriya ku van gotinan bibêje kulmê zarokan bi her du destê xwe digire, dide ber rûyê xwe, kulmê zarokan çiqas germ be, ewqas navê xwarina xweş dike.) "Ka ez vekim lê binêrim" dibêje û wisa dom dike: Himm ev kutilk e, ezê jê têr bixwim, min bêriya vê xwarinê kiribû, de baş e te xweş pijandiye, ez têr bûm, ji vê kutilkê, tu jî bixwe.

Ev lîstik ji bo hemû zarokên ku li wê derê amade ne, bi navê xwarinên xweş didome. Tê zanîn ku xwaringeha Kurdistanê gelekî dewlemend e, ji ber vê yekê di lîstikê de çiqas navên xwarinên xweş bê gotin ew qas çanda aşxaneyê kurdan jî ji aliyê zarokan ve tê zanîn.

Hecî Batman

Ev lîstik jî ji aliyê 6-10 zarokan ve tê lîstin. Keç û lawik bi hev du re dilîzin. Beriya ku lîstik dest pê bike, zarok hev û din dihejmêrin. Ev hejmartin dibe ku bi hêkil-mêkil be. Hemû kesên ku di vê lîstikê de cihê xwe girtine, bi hejmartinê derdikevin. Yanê dest were ser kê, ew azad dibe, yê dawiyê bar hildigire û lîstik dest pê dike. Navê vê lîstikê Hecî Batman e.

Lîstikvan kom dibin. Yek ji wan dibe serok û zarokan dihejmêre. Yê li dawiyê maye dibe barkêş. Barkêş xwe deverû li erdê dirêj dike, çav û rûyê xwe bi baskên xwe vedîşêre. Gere yê ku bar hildigire, kesekî nebinê. Barkêş dema xwe deverû li erdê dirêj kir, gere ling û çimê xwe dirêj neke û bi baskê xwe rûyê xwe û çavên xwe veşêre.

Lîstikvan li ser barkêş kom dibin. Destê xwe qat bi qat datînin ser piş-



ta barkêş û dest bi çivanokan (tekerleme) dikin. Tev bi hev re bi dengêkî dibêjin: Hecî Batman, Hecî Batman/ destê kî/ ser/ ya desta,/ yê kî-îl...

Barkêş navê hevlekî dibêje. Mînak dibêje: "Destê Delîl li ser ya desta ye." Heke destê ku barkêş got rast be, wê çaxê barkêşa bîndest azad dibe, yê navê wî/ê hate gotin dibe barkêş. Lîstik dîsa dewam di-

ke.

Not: Hevalên ku vê lîstikê dilîzin carinan derewan dikin. Dibêjin: "Te rast negot, ew navê ku te gotiye şaş e, ew hevlekî din bû." Armanca vê derewê ev e ku barkêş hinek aciz bibê. Lê gere ev derewa hanê dirêj nebe, ji ber ku xweşiya lîstikê kêmtir dibe.

DÎCLE NAS

Tiştonek Miştonek

- 1 - Karika kejik, li ser hejik SOM
- 2 - Siwarê rûtê, sibê dereng dihere, êvarî zû Sêrk
- 3 - Min ji dûr ve lê nerî, bi zêra kirî kumik rakir, serî gurî Red
- 4 - Odek şuştî, 33 zilam lê rûniştî Dîstir
- 5 - Ser wî texte bir wî texte, orta wî zilamekî bêbextî Korî
- 6 - Simê gê tije xwê Hêstir
- 7 - Tiştêk min heye, her sibe rûyê min dimale Destmîstik

- 8 - Ez disekinim, yekî tenê ye ez diherim dibe du heb Zî
- 9 - Bi can e, ne li erdê ne li ezman e Pînkêkî tî rîwî
- 10 - Tenûra him himî, tije nanê gêmî Gwîz
- 11 - Hilindir milindir, law ji bayê bilind tir Dixan
- 12 - Kofiya Şengalê, hol bû li navê Zîpik
- 13 - Şivek ter li guher Mar
- 14 - Elbek mast, li guherêk rast Hiv
- 15 - Li kevir didim naşkê, li avê didim dişkê Pêlî

- 16 - Gayek heye Suriye binê wî dimale, Tirkiye şîrê wî didoşe Şîrê bî tîwêş
- 17 - Ser wê cam binê wê cam û orta wê behr e Tîpê
- 18 - Tiştêk heye ez destê didêm lê dikê Pêstir
- 19 - Tiştêk min heye, ez lê dinêrim, tiştan ji min re dibêje Tevîstir
- 20 - Pîrek li hundir, porê wê li derve Zorê

Nûdema nû



Kovara Hunerî, Zîhel û Çandî

manê kurdî ye. Cewerî bi mînakên balkêş, tiliya xwe datîne ser vê birîna me ya kêmgirtî. Di gotarê de tê gotin ku gelek saziyên ku weşanên bi kurdî derdixin ji ber kesad-bûna bazarê ketine tengasiyê û dev ji weşandina berhemên bi kurdî berdane. Dîsa di vê hejmarê de li ser helbestvanê kurd Hemîd Bedirxan nivîseke hêja cih girtiye. Bi

Hejmara 22'yan a kovara çand û hunerî Nûdem derket. Ev hejmara kovarê bi pêşgotineke xwedî û berpîrsê kovarê Firat Cewerî dest pê dîke. Sernavê vê gotarê "Ji bo kurd bi kurdî naxwînin" e, her wekî vî sernavî jî tê zanîn, nivîs li ser kêmbûna xwendevanên zi-

vê nivîsê mirov vî helbestvanê hêja ji nêzik ve nas dîke. Di nava nivîsê de çend parçe ji hinek helbestên wî jî hatine veguhestin. Di dawiya nivîsê de tê gotin ku Hemîd Bedirxan piraniya helbestên xwe bi zimanên biyan nivîsîne, lê kêma berhem bi kurdî dane. Mirov bi vê rastiya tal ge-

lekî diêşe û mirov hinekî dilsar dibe.

Digel van nivîsan, nivîsa Kemal Mazhar Ehmed a bi navê "Serefname di kurdnasiya Sovyetê de" ku ji hêla Ziya Avcî ve ji kurmanciya jêrîn bo kurmanciya jorîn hatiye wergerandin gelekî balkêş e.

Ji vê nivîsê tê fêmkirin ku lêkolîner û lêgerînerên Sovyetê gelekî girîngî dane vê berhemê. Bi belavbûna vê berhemê hinek baweriyên çewt ên der barê kurdan de jî guherîne. Bo nimûne li gorî Rojhilatnasê navdar Orbêlî kurdan piraniya xebatên xwe li ser navê gelên din kirine, ew jî bûye sedeme baweriyê çewt ku kurd nikarin ji bo xwe tişteki bikin. Lê bi vê berhema hêja ew bawerî guhariye.

Her wiha di vê hejmarê de Fawaz Husên li ser Moliér, Şerefxan Cizîrî jî li ser Marks û Manifestoya Komunîst radiweste. Ji bilî wan li ser navê kovarê hevpeyvînek digel stranbêj Delal hatiye kirin. Kesên mîna Mehmet Uzun, Şahîne B. Soreklî, Xebat Arif, Şefîk Kaya, Sabah Kara, Badalravo, Emîn Narozî, Necîp Mehfûz bi berhemên xwe di vê hejmara Nûdemê de cih girtine.

SEWÎSA ÇANDÊ

Ji Înstîtuya Brukselê pirtûkeke cihêreng

Bi geşbûna doza kurdî, saziyên cur bi cur derketin holê. Her wiha saziyên zanistî û çand û hunerî jî dest bi xebatê kirin. Li ser mijarên cur bi cur pirtûk tîne weşandin.

Êdî kurd di neqandina mijaran de xwe bi warên siyasî sînor nakin. Hin caran weşanên gelekî cihêreng jî dikevin nava pirtûkxaneyên kurdî. Pirtûka "binêr... ez mezin dibim" berhemeke bi vî rengî ye. Ev pirtûk jî hêla Serokê Înstîtuya Kurdî ya Brukselê Derwêş M. Ferho



ve hatiye wergerandin. Ferho ew pirtûk jî flamanî wergerandiye. Pirtûka navborî li ser mezinkirin û xweyîkirina zarokan e. Ev berhem jî hêla komîteyê Zarokxaneyê Zanîngeha Katolîk ya Leuven ve hatiye amadekirin. Pirtûk jî destpêkê heta sê saliyê li ser rewş û tevgerên zarokan digel wêneyên xêzkirî, agahiyan dide.

Pirtûk jî bo malbatên ku dixwazin zarokên xwe ji nêzik ve binasin û li ser hest û tevgerên wan agahdar bibin berhemeke girîng e.

Li Moskovayê bihar

FAYSAL DAĞLI



Moskovaya paytext gerdûnî ya demekê, paytexta îdeolojiyê mezin, paytexta sosyalîzmê, niha bûye axurê siwarên hov ên kapîtalîzmê. Di hemû kolan, avahî û hemû rûçikên mirovan de şopa bihuştê jidestçûyî tê dîtin. Li Moskovaya bajarê şaristaniya cemidî niha bihar e. Niha li Moskovayê bihara kapîtalîzmê ye.

Hezar û sêsed rêxistinên mafyayî jî nivî zêdetirê aboriya Rûsyayê xistine destê xwe. Li gelek bajaran mirov di rewşa xizaniyê de, li gelek jî li dor tixûbê birçîbûnê dijîn. Li restorantekê Moskovayê pizayek bi 25 dolaran e û li nexweşxaneyekê meaşê hekîmekî 150 dolar e. Ew rewş kurteçîroka Rûsyaya îroyîn e. Û sekreterê kevn ê Moskovayê ê Partiya Komunîst a Sovyetê û serokê Rûsyaya niha Borîs Yeltsîn, dixwaze

mozoleya Lenîn a li Meydana Sor rabike. Komunîstên ku pîrên wan salên dawiya temenê xwe dijîn jî bi alên Sovyeta berê, Yeltsîn protestoya dikin!

Piştî ku perdeya ji pola, ji holê rabû û sistema Sovyetîk pelişî, Rûsyaya ji nav kavi-lan vejîya. Dengyên siyasî yên cihanê li ser bîngê nû rûniştin. Guhartina mez-intir li Rojhilatê Navîn çêbû. Vejîna Rûsyaya û ya kurdan rastî heman rojan hatin. Raperîna Başûr û serhildanên Bakur, bi çarên Kremlînê yê nû re, heman demî li sehneya siyasî bi cih bû.

Teb'ên pêşketinên nû li ser xerabûna dengyên kevn derket holê. Yanê mutfikên Moskovayê yê kevn belav bûn. Û Tevergera Kurd qaşî ku ji îtifaqên navneteweyî re hewcedar be, bûbû hêzeke jîndar.

Lê reqsa rûsan/Sovyetê û ya kurdan jî destpêkê heta îro bi awayekî nexweş meşiyabû. Xwendevanên Moskovayê rengê wan çî dibe bile bibe, bikaranîna kurdan kiribûn bîngeha siyaseta xwe.

Di bihara nû de Rûsyaya careke din kur-

dan kişî dîke. Dengê Hereka Kurd ku Rojhilat dihejîne û anti-împeryalist e, ji dîwarên qesra Kremlînê ya Sor ve jî derbas dîke. Niha Moskova wê tercîha xwe bike. Ka wê kurdan li Rojhilat wekî mutfikê bibîne an na? Ji bo vê yekê hereka kurd jî nêz ve dişopîne. Di bin baskê komîsyona jeopolîtîk ku perspektîfan dide parlamentoyê û jî endamê parlamentoyê pêk tê, grûbeke ji pisporên pîrsa kurdî ava kiriye. Di van demên dawîn de siyaseta xwe ya der barê Kurdistanê de jî bi pêş xistiye û çend biryar li ser vê pîrsê girtine.

Çalakiyên kurdan ên li Rûsyayê jî wekî ku bi çav bînin dîtin, bi pêş ketiyê. Êdî kurdên wê deverê jî daxilî şerê li dayika niştîman dibin; alîkariyê dikin û dibin perçeyek ji tîkoşîna neteweyî. Hereka Kurd heta Sibîryayê jî diçe, kurdên wir bi rê dixê û li Moskovayê mîsyona diplomatîk vedike, xebatên lobiyê di parlamentoyê de dimeşîne.

Belê hem patronê Kremlînê guherîna hem jî kurd. Êdî ger îtifaqek hebe jî, ev wê ne li ser paşçavkirina berjewendiyên kurdan be. Hereka Kurd di çembera felekê re derbas bûye. Moskova niha di pêvajoya biryardayîne de ye!

Xalê Simo û Qaymeqam

Xalê Simo li gundekî Kurdistanê dijî. Rewşa wî ya aborî ne baş e, lewre jî debara malbata wî bi zor û zehmet dibe. Rojekê kera Xalê Simo bi belayê dikeve û dimire. Gundî têne serxweşiya Xalê Simo, û dibêjin: "Xalê Simo bila serê te û malbata te sax be, lê ma qey çi hewala kerê te bû heta mir?" Xalê Simo dibêje: "Kerê min nemiriye, kerê min çûye axretê, daran ji agirê cejnemê re dikşîne, da ku kesên zordest û xwînmiy xweş bêne şewitandin di nav agirê dojhê de"

Muxtarê gund dibêje: "Xalê Simo sibehê here bajêr cem qaymeqam rewşa xwe jê re bibêje, belkî hinek alikariyê bide te. Lê çawa ku tê gotin qaymeqam mirovekî dilnêrm û mirovhez e. Da ku qene tu ji xwe re kerêkî bikirî" û Xalê Simo dibêje: "Ez bi tirkî nizamim ezê çawa ji qaymeqam alikariyê bixwazim?" muxtar dibêje ku, bibêje; "Qaymeqam efendî



benim eşeğim vefat etmiş bana biraz yardım et, kendime bir eşek alayım." Xalê Simo sibehê diçe bajêr û cem qaymeqam. Li deriyê qaymeqam dide û qaymeqam tê jê re derî vedike û dibêje: 'Dayi sen mi kapıyı çaldın' Xalê Simo dibêje: "Belê min li deriyê te xist" û qaymeqam dibêje: 'Ne îstiyorsun söy-

le', Xalê Simo dibêje: "Qaymeqam efendî eşek axrete gitmiş, sana eşek demeye gelmişim" û qaymeqam hêrs dibe û derî paşve digire û diçe hundir. Qasekî dimîne, dîsa dilê qaymeqam pê dişewite û dîsa tê derî vedikê dibêje: 'Sen demin benden ne isteyecektin, tekrar iste.' Xalê Simo dibêje "Ma ne te ne-

hişt ku ez daxwaza xwe bo te bibêjim. Her wekî mirov berazan ji daristanê biqewitîne, te ez wekî berazan ji devê deriyê xwe qewitandim, ev bû mirovhezkirina te qaymeqam efandî?" û dîsa qaymeqam hêrs dibe û derî li ber Xalê Simo digire û edî lê venagere. Xalê Simo vedigere tê gund û gundî diçin balê û dibêjin: "Ka te çawa kir, qaymeqam alikariyêk da te, an na?" Xalê Simo dibêje: "Na tişteka neda min"

Muxtarê gund dibêje: "Te çi ji qaymeqam re got?" Xalê Simo dibêje: "Ew tiştê ku te gotî min, min ji ew jê re got." Muxtar dibêje: "Ka dîsa bibêje te çawa gotiye?" Xalê Simo dibêje: "Min got qaymeqam efendî benim eşeğim axrete gitmiş, sana eşek demeye gelmişim."

Muxtar dibêje: "Hey malxirab te gotiye qaymeqam tu ker î, çawa qaymeqam tu ne avêtî girtîgehê?"

HALİL GÜLER

BIXELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (73) XAÇEPIRSA


N	E	E	L	F	A
T	H	S	N	T	A
Z	E	R	A	R	İ
R	A	M	A	N	İ
N	A	R	İ	N	T
P	N	K	A	N	İ
E	N	T	E	L	V
A	R	F	İ	L	
T	D	E	R	Ü	N

PEYVA VEŞARÎ → DAZANIN

Bersiva Xaçepirsa 71'ê


Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 73'yan Pirtûka Celalettin Yöyler (Gelperwerî û Nijadperestî) ye

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 71'ê Încîla Yûhana qezenc kirine. **Egît Doğan/ İskenderun, Hasan Say/ Zîlel, Cem Yılmaz/ Stenbol, Ahmed Akıncı/ Samsun, Mehmet Cem/ Sîwerek**

Sinc bi tirkî	Ji yek welatî	Dê. dayik	Şehideke kurd	Tipeke kurdi	Dever
Hunermen dek (wêne)	Cinavkek		Xweda		
		1			Sembola helyûmê Dewleteke ciran
Tûmîkê zebeşan		Kelin			
Ling		Cinavkek			Kûçik
	Cinavkeke kesane		Welatê Jêr		
	Rêwingî		Nijadek		
To yê II ser pasteyê				Tipek	Filmeke Y. Güney
Gihanekek		3		Gihanekek	Tipeke kurdi
	Eşir				Him
	Hêsan	2	Sûret		Bajarekî Kurdistanê
Dengî					
Aveke kîmyewî				Tipek	
		6	Nayê	Daçekek	
				Di iskanbîlê de yek	
Paytexta Yewnanist anê					Sembola helyûmê
Cephe					
			Bi sorani nika		



PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6



Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayınclık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMÎ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTPYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewropayê:
Mazhar Günbat
Tel: 00 32
53 64 12 62
Brüksel-
Suriye:
Jan Dost
Helim Yûsiv
Berlin:
Silêman Sîdo
49-30-69002695

Hannover:
Selim Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçılıç
49 228 66 62 49

Mîtinga KESK'ê

Roja 15.06.1997'an mîtingek ji aliyê KESK'ê ve bi navê "Özgür Emek, Demokratik Türkiye (Keda azad, Tirkeyeya Demokrat)" li Meydana Abide-î Hürriyet hate lidarxistin. Bi piştigiriya gelek partiyên siyasî, sendîka, kovar, rêxistinên girseyên demokratîk, kedkaran polîtîkayên hikûmetê şermêzar kirin. Mîting bi beşdariya heşt hezar mirovî hate çêkirin. Di nav beşdaran de girseya HADEP'ê bi pîrbûna xwe bal kişand. Di berdevwama mîtingê de tu bûyer derneketin, carekê ala PKK'ê li meydanê hebû. Li ser ve yekê, polîsan xwe girêdan û amadehiya erîşa ser gel kirin, lê bi navberiya hin kesên berpîrs polîs bi paş ve vekîşyan.



tîkayên siyasî, civakî û aborî bîdomin, bi hilbijartinên zû, bi guherandina hikûmetan ev kûz ji holê ranabe." Piştî axaftina Aşkîncî, girseya kurd siloganên wekî "Bijî biratiya gelan", "Bijî Serok Apo", "Dijmin ji başûrê Kurdistanê derkeve", "Li başûrê Kurdistanê serkeftin a gerilayan e" avêtin. Piştî ku slogan hatin avêtin komê Kızılırmak konserek da, konsera Kızılırmakê dilê beşdaran geş kir.

Her wiha mîtinga ku wê li Ruhayê bihata lidarxistin, ji ber nedana destûrê, pêk nehat. Lê bi beşdariya rêveberên 300 karmendên ji Amed, Mêrdîn, Ruha û Semsûrê daxuyanîyek hate dayîn. Li wir polîsan erîş bir ser karmendên ji Egitim-Sen, Tarim-Sen, Bel-Sen, Yol-Senê û xebatkara Rojnameya Demokrasiyê hate girtin.

Li aliyê din HADEP'a Qoser bi beşdariya 2.500 kesî hebû. Di merasîma vekirinê de Murat Bozlak û Ahmet Türk axaftin kirin.

Her wiha piştî ku gişt girse li Meydana Abide-î Hürriyet gihîşt hev bi dest bernamêyê kirin. Li ser navê GENEL İŞ'ê beşdêrê Şubeyên Platforma Stenbolê Hasan Zenk, dîtin û ramanên xwe anîn ziman. Zenk di axaftina xwe de bi giştî li ser rewşa Tirkiyeyê ya îroyîn û li ser hikûmetê sekinî.

Di mîtingê de Berdevkê Karê Perwerdehiyê yê KESK'ê Cengiz Aşkîncî, bi giştî li ser biryarên MGK'ê û rojeva li ser şerîat û laîkiyê rawestîya. Aşkîncî wiha axivî: "Hetanî ku ev polî-

Gundê dayika û çar warê
Badika
Sala 1994'a 18'ê Pûşperê
Stêrkek qulibî
Betrek bi per û baskê
xuda hate lédan
Bi xayînî bêzeman
Meha Pûşperê germ bû
Doza te germ bû
Ala sor bi ser xwîna te ve bû
Me sond xwariye lawo
Ya mirin, ya azadî
Em agirê doza te germ dikin
Ey Şehidê Kurdistan
Metîn (Ceng)
Meha Pûşperê germ e
Em bi germayê pûşperê te silav dikin.
Ey Şehidê Artêşa Kurdistan
Hezar sal jî derbas be em we ji bîr nakin.



Metin Akdağ (Ceng)
1972-1994

Le ser navê malbata wî Dayika wî Meyse Akdağ - Stenbol

Bi dengê bilind çû
Gava ku ji şînen giran re rûdiniştin
jinên Seregola Serhedê, ji bo
şehadeta Firat, Serhed, Yûsif û
Azad, pira. Afrodîtê jî dihat cih
digirt di nav dayikên şehîdan,
şervanan û girtiyan de, li çoka xwe
dixistin, rûyê xwe diherîsand ji koça
bedewî û jiyanan re. Çi fikir
Arîs...



Azad Öztürk
1975- Gulan 1997

Êdî wexta mirinan ne! Li ser navê malbata wî A. Mecit Öztürk

- arîşe: kêşe, pîrsgirêk, problem
- bendav: baraj
- berbiçav: konkret (somut)
- berz: bilind
- bijûnbûn: bisihetbûn
- bişaftin: asimilasyon
- B. Z: berî zayînê
- çewt: şaş, xelet, (yanlış)
- dabaş: mijar, babet, mewzû
- dews: cih, şûn
- erdnîgarî: cografîk
- fîtkirin: tahrîkkirin (kışkırtmak)
- gerdûnî: cihanî (beynelmîlî)
- giramgirî: rêzgirtin, hurmet

Ferhengok

- hevpar: hevbeş, pişkdar, mûsterek
- hilberîn: berkêşin (üretim)
- jixweber: otomatîk
- konevanî: ramyarî, siyasî
- lawaz: qels, jar, zêif
- lebat: tevger, hereket
- leheng: qehreman, mîrxas, nebez
- melkemat: ezraîl
- mêtinger: kedxwar (sömürgeci)
- mijûlî: pêdaketin (uğraşma)

- navgîn: amûr, vâsita
- nexasim: bi taybetî, nemaze (özellikle)
- parzemîn: qita
- pelixandin: perçiqadin, pankirin
- perge: belge
- peywendî: têkilî, danûstandin (ilişkiler)
- pispor: şarezî (uzman)
- sereta: pêşîn, yekemîn
- seyr: ecêb, balkêş, enteresan
- şaristanî: medeniyet
- veguhêstin: naqilkin
- vejin: ji nû ve jîndar bûn (diriliş)
- wateya mertalî: Bi awayekî giştî
- xewroşk: efsane

Berpirsê arîşeyan Amerîka û sermayedarên mezin in

Ertuğrul Kürkçü got ku hêzên sosyal demokrat ji nexweşiya di navbera laîk û îslamiyan de sûdê werdigirin. Li gorî Kürkçü komên çepgir, li dijî darbeyê bi şeweyekî tund helwest nagirin, lewre civak bi piranî li dijî RP'ê alîgiriya darbeyê dike, hêzên çepgir jî ji bo ku ji civakê tecrît nebin, helwesteke nerm nîşan didin.

Li Rojhilata Navîn rûdanên dîrokî pêk tên, bi taybetî piştî hevkarîya Îsraîl, DYA û Tirkîyeyê dagirkirina başûrê Kurdistanê welatên herêmê li dijî vê hevkarîyê têkiliyên xwe xurtir kirin. Her çiqas operasyonê li ser Başûr ji aliyekî ve li dijî Tevgera Kurd be jî, bêhtir ji bo kontrolkirina Rojhilata Navîn e. Li dijî vê yekê piştî 17 salan Sûriyê û Iraqê deriyên sînorên xwe li hev vekirin. Peywendiyên Îran û Sûdî Arabîstanê ber bi germbûnê ve diçin. Cara yekemîn e ku Wezîrê Karên Derve yê Îranê diçe serdana Misirê, lê rûdana herî girîng ev e ku êdî welatên ereb qala "bazara hevbeş a ereban" dikin.

Her wiha wekî tê zanîn Wezîrê Karên Derve yê Misirê Musa Amr di civîna D-8'an da da xuyand ku divê kêşeya kurd bi şeweyekî aştiyane bê çareserkin. Ji aliyekî din ve li dijî van kirinan DYA'yê jî hefteya borî Qûdus wekî peytexta fermî ya Îsraîlê pejirand. Wekî tê zanîn di gel Tirkîyeyê gelek welatên cihanê Qûdusê wekî paytexta fermî ya Îsraîlê qebûl nakin.

Ji bo ku mirov rûdanên dawî yê Tirkîyê fêhm bike, divê pêşî rewşa dawîn ya Rojhilata Navîn bide ber ronahiyê. Di bingeha rêzên brîfing û gotegotên darbeyan de, daxwaza kontrolkirina herêmê, cihê girîngtirin digire. Tirkîye hem ji bo ku li dijî Tevgera Kurd piştigiriya welatên wekî Îsraîl û DYA bigire û li herêmê xurtir bibe, hêzên îslamî wekî tehdîta sereke nîşan dide.

Li ser rûdanên navborî nivîskar û siyasatmedar Ertuğrul Kürkçü, wekî sedema navxweyî, xurtbûna hêzên îslamî û şerîatxwaziya RP'ê nîşan da. Li gorî nîrxandina Kürkçü, RP di bingeha xwe de ji bo sistemeke şerîatî tê dikoşe û ji bo vê yekê xwe bi çek dike. Dema mirov bi vî çavî li mijarê binêre, RP wekî tehdîtekê li dijî sistemê xuya dike. Li hemberî vê gotinê, mirov dikare gotinên Gerîndeyê Weşanê yê Rojnameya Yeni Şafak Mehmet Ocaktan li vir bide. Li gorî Ocaktan, ji bilî tevgerên ku doza parçekirina welêt dikin, tu tevger sistemê tehdît nakin.


Sedema nexweşiyên li

herêmê DYA ye

Nivîskar Kürkçü wekî sedema bingehîn a rûdanên hundirîn, daxwaza kontrolkirina Rojhilata Navîn nîşan da. Kürkçü, bal kişand, ser lihevkerîna berjewendiyên Tirkîyeyê û DYA'yê. Piştî jî wî diyar kir ku kirîna DYA û Îsraîlê ne bi tenê li dijî Tevgera Kurd in. Kürkçü helwesta DYA jî bi têkçûna politîkayên wê yê Rojhilata Navîn ve girêda û got ku DYA dixwaze ji nû ve li herêmê bibe desthilatdar. Li ser helwesta Tirkîyeyê jî Ertuğrul Kürkçü da zanîn ku Tirkîye li hemberî welatên ereb dev ji politîkayên nerm berdaye. Bi gotina Kürkçü, kêman jî Tirkîyeyê ji bo ku li Asyaya Navîn, desthilatdariya xwe xurtir bike, li hemberî DYA'yê jî derdikeve.

Mehmet Ocaktan, daxuyand ku politîkayên Tirkîyê yê li ser Rojhilata Navîn li herêmê dibin sedema nexweşiyên. Ocaktan got ku ev politîkaya Tirkîyeyê wekî tişteki normal reaksiyonên welatên herêmê dikşîne. Ocaktan axaftina xwe wiha domand: "Hevkarîya Îsraîl û Tirkîyeyê wê hevkeşeya Rojhilata Navîn serûbin bike. Lê bi dîtina min, di navenda van bûyerên li hundir de Îsraîl û Ewropa hene. DYA li Tirkîyê darbeyekê naxwaze ji ber ku ev li berjewendiyên DYA nayê."

Rojnameger Ocaktan, bi taybetî li ser nakokiyên di navbera sermayedarên mezin û biçûk de rawestiya û diyar kir ku sermayedarên mezin, li dijî sermayedarên Anatoliyê artêşê fit dikin. Ocaktan wiha peyivî: "Piştî deshilatdarbûna Özal sermaye bi awayekî berfirehtir, li hemû Tirkîyeyê belav bûn û niha her diçe xurt dibe. Ji ber vê yekê hin holdîngên bi televîzyon û rojnameyên xwe li dijî van sermayedarên biçûk fitnekariyê dikin." Li ser vê mijarê nivîskar Ertuğrul Kürkçü,



Nakokiya navbera hikûmet û artêşê di warê têkiliyên navneteweyî de jî tê dîtîn. Li aliyekî generalên tirk li pey hev bi Îsraîlê re peymanên leşkerî girê dide, li aliyê din Partiya Refahê welatên misilman di bin navê D-8 de li Stenbolê dicivîne. Li jor wezîrên çandê yê welatên D-8'ê bi hev re tên dîtîn.

çü, da zanîn ku, sermayedarên îslamî bi taybetî, ji ber nasnameya xwe ya îslamî li Rojhilata Navîn, ji van sermayedarên mezin xurtir dibin. Ev yek hin derdorê ditirsîne.

Diyar e ku bi şeweyekî zaneyî RP wekî xetereya herî mezin tên nîşandan. Li ser vê mijarê nivîskarê rojnameya Radikal, Ümit Kıvanç, roja 16'ê pûşpera 1997'an di quncikê xwe de balê dikişîne ser vê yekê. Li gorî Kıvanç hin kes bi zanafî dixwazin rê li ber geşbûna demokrasîyê bigirin.

Darbe jixweber çêdibin

Li aliyê din Ertuğrul Kürkçü da zanîn ku artêş darbeyê nake. Lewre pêdiviya wê bi darbeyê nîn e, her roj derbeyên sîvil tên lidarxistin. Lê ji bo ku parlamenta nikare tişteki bike, hêzên leşkerî û hin sermayedar, zorê didin parlamentoyê. Kürkçü got ku, ji ber ku qirêjiya vê bûyera Susurlukê gihîştibû artêşê jî niha ji bo perdekirina rastiyan dubendiya îslamî û laîkan avêtin holê.

Gerîndeyê Rojnameya Yeni Şafak Ocaktan daxuyand ku êdî darbe bi şeweyekî cuda tên lidarxistin. Jixwe pêvajoya darbeyê, 28'ê reşemiyê dest pê kir û van rojan jî qediya. Ji aliyekî din ve nivîskarê Rojnameya Herald Trubenê, Philip Gordon li ser vê yekê dide zanîn ku, li Tirkîyeyê darbe nayên lidarxistin, lê bêyî kirina darbeyan wê darbe bibe.

Wê ev yek bi awayekî domdar bidome. Û welatên rojavayê jî bi dilgermî, nêzîkî vê rewşê bibin.

Li hemberî darbexwazan, helwesta herî balkêş, ya çapemeniya tirk û partiyên siyasî yê tirk e. Ertuğrul Kürkçü li ser vê yekê got ku hêzên sosyal demokrat ji nexweşiya di navbera laîk û îslamiyan de sûdê werdigirin. Kürkçü jî bo komên çepgir jî wiha axivî, komên çepgir, li dijî darbeyan li şeweyekî tund helwest nagirin, lewre civak bi piranî li dijî RP'ê alîgiriya darbeyan dike, komên çepgir jî bo ku ji civakê tecrît nebin, li dijî darbeyê bi awayekî tund dernakevin.

Ji bo nêzîktêdayîna dewletê ya ji bo kêşeya kurd, Kürkçü û Ocaktan bal kişandin ser tûjtirbûna helwesta dewletê, li ser vê mijarê Rojnameger Mehmet Ocaktan diyar kir ku di dema Özal da nîşanên nermbûnê hebûn û hêviya me ev bû ku ev helwest xurtir bibe. Ocaktan got ku li ser çareserkerîna kêşeya kurd dewletê bê politîka ye û wiha axivî: "Rewş ber bi xerabûnê ve diçe, tirsî min ew e ku di rojên li pêşiya me de emê nikaribin li ser vê mijarê biaxivin." Her wiha Kürkçü jî li ser vê mijarê wiha got: "Wekî encam Tirkîyeyê ji bo kêşeya kurd di politîkaya xwe de tu guharîn pêk neanîne. Hewl dide xwe ji bo ku dijminê xwe yî sereke PKK'ê jî holê rake. Bi dîtina min Tirkîye bi şeweyekî otorîter ji nû ve vegeyariya ser çareserîya Özalî."

MAZLUM DOĞAN